

Sal:2 Hejmar;60 11-17 Nisan 1993 5000TL (KDVR)

Rojnameya Hefteyi



Serokê KMM'ê Akin Bîrdal:
*'Banga PKK'ê
fersendeke
girîng e'*

Rûpel 5

Rayedarê dewletê di 7-8'ê Nîsanê de li Kurdistanê derketin seferê û soz û peymanê kevin tekrar kirin.

Gera gel xapandinê

Rûpel 8

• Serokwezirê Tirkiyê. bi hemû rayedarên sereke yên dewleta Tirk re. li Kurdistanê derketin seferê. Di vê seferê de. Demîrel dîsa weke her car behsa demokrasiyê kir. pesnê xwe û hikûmeta xwe da û wadêñ mezin anîn zimên. Demîrel soz da ku. heta meha Hezîranê wê "Rêveberiya Taybetî" ji Kurdistanê rabike. Bes gotinêñ wi. ji aliye gel ve cidi nehatin dîtin.

• Di destpêka avabûna hikûmeta koalisyonê de Demîrel gelek soz û peyman dabûn gelê Kurd û Tirk lê heta niha tu problemên gel nehatine çareserkirin. Nexusim li Kurdistanê çareserkirina pirsgirêkan li aliyeke. tevlîhevî. zilm û zor ji berê jî zêdetir bû. Ji ber vê yekê wisa xuya dikir ku. Demîrel bi xwe jî. ji gotinêñ xwe yên di geşta Kurdistanê de anîn zimên. bawer nedikir.

• Avahiyeke dîrokî: Dêra Zahferan

Jîr Dilovan

Rûpel 6

• Tirkîye hebûna xwe ya dagirker zexim dike

Ercan Kiliç

Rûpel 3

• Xelata sulha Kemal paşa

Nivîsa Musa Anter di quncikê wî de

Rûpel 7

• Argota Kurdi

Amed Tigrîs

Rûpel 10

• Serpêhatiya îtîrafkarekî poşman

Rûpel 3

• Li Swêdê panela ziman û edebiyata Kurdi

Rûpel 11

• Ji bo zarokêñ Kurd, dîroka Komara Mehabadê

Rûpel 15




DI WARÊ LÎTERATURÊ DE PÊNUSEKE TÛJ

İbsen di edebiyata dinê ya nû de. xwedî ci-hekî girîng e. Di warê dramayê de tesireke mezin afirandiye. Dramatîkerên ku ji paş wî hatine, zêde di bin tesîra wî de mane. Li şanoyan, qabiliyeta İbsen sembolek e.

Gavan Koçer nivîsi

Rûpel 13



'YEKİTİYA ZİMÊN ARMANCA ME YE'

"Dijmin tenê bi leşkerî êrîşî Kurdan nekiriye û nakek, ew her wiha di warê ziman, çand û dîrokê de jî êrîşen xurt tînin û anîne û wê hîn bînin jî. Bê guman me jî heta niha xwestiye ku tenê bi leşkerî lê di her warî de li ber xwe bidin."

Di rûpela 11'an de bixwinin

REWŞ



Abdullah Keskin

Civakê derengmayî

Teknoloji, ji sedsala 17'an ve di jiyana civakî de giraniya xwe da xuyakirin. Adet, tore û ramânê civakê, ji wê demê ve di bin vê giraniye de dihelin. Serûbinbûna civakê, ji aliyeke ve bi teknolojiye ve girêdayî be, ji aliye din ve jî bi reformen din û ronesansê ve jî, di têkiliyê de ye. Pêşveçuna teknikî, reform û ronesans bi hev re ne, her yek sedema ya din e. Li Rojava ronesansê din berteref kir, aqil serfiraz bû.

Em civakên Rojhilat, me ev dîlana pêşveçün û guherinê dereng fêm kir. Hê jî em ne gîhiştine wî kerwanî. Te divê bila îslamî be, an jî sosyalist, berê herkesi li wê riyê ye. Alternatifke cihê heta niha derneketiye.

Piştî sed-dused salî, di destpêka sedsala bîstan de li welatên Rojhilat, nivîskar û zanayê dîndar ên wek Cemaledîn Efganî, Muhammed Abdul, Hasan el Benna, dema nû û dîtinê xwe wiha formule dikirin: "Paşmayîna welatên misilman, ne jî îslamî ye. Se dem rîvebirîn misilman in. Wan tu caran, prensibîn dînê îslamî neceribandin."

Ji bo çareserkirina pirsgirêkê jî reçeta wan hazır bû: "Emê zanyarî û tekniķa Rojava bigirin û ji raman û adetên wan dûr bikevin." Dema derbasbûyi, gelek tişt zelal kîrin. Hesabê malê û

sûkê (çarşiyê) li hev derneketin.

Gelek niqteyên girîng nedîtin, van aliman. Berî her tiştî teknoloji, jiyan û adetên nû, standartên xwe bi xwe re tîne. Jîneke bi çarşef nikare li febrîqeyekê bixebe. İro teknoloji di nav civakên misilman tev de, belav bûye. Lî ci bû? "Du paradigmâ hevdu mekroh kîrin, hevdu notralize kîrin" û li dawiyê bi şikî'man.

İro em dibînin dîn, hêdî hêdî dikeve seviya îdeolojiyeke dînyayî de. Ayet û hedîs, dibin formulasyonê sosyolojik ên marksist. Wî çaxî jî, tu cazîba dîn namîne. Uliyeta xwe winda dike. Rexneyê bi navê dîn ku binê wan were kolandin, wê psikanaliz, tahlîlîn sosyolojik an jî modernîzm derkeve.

Em civakên Rojhilat, me ev dîlana pêşveçün û guherinê dereng fêm kir. Hê jî em ne gîhiştine wî kerwanî. Te divê bila îslamî be, an jî sosyalist, berê herkesi li wê riyê ye. Alternatifke cihê heta niha derneketiye.

Erê însan ne hakimê pêşerojê û qederâ xwe ye, aciz e, kîmasiyê sîstema nû zêde ne, lê dîn jî li dijî van, ne stargeheke. Bersiva demê nade. Bersivê dide jî, jê biyan in.

Dîn û îdeoloji, êdî nikarin zêde rengên civakê biguhérin. Teknoloji bûye bingeh. Welat û civak tev de modernîze dibin. Di nav welatekî fileh û misilman de, ji vî alî ve zêde tu ferq nemaye. Di hemû civakan de teknokrat, şirket hene, burokrasî û medya heye. Ew jî civakê li gorî mantiqê xwe diguherin.

Jiyanekê bêteknojî, mimkun e an na; mirov dikare bifikire. Lî di şertên i-ro de dewleke bêteknojî nabe. An ew bi xwe çedike, an jî ithal dike. Welatên Ewrûpa, Sovyeta berê û dewletên sosyalist, Japonya, Amerika û dewletên misilman mînakêne eşkere ne. Burokrasiya Sovyeta berê û Îranê ne kêmî ya welatên Rojava ye.

Qalibê kirâsên ku mirov di serê xwe de ji bo jiyanê çedike her çaxî lê nayê. Di ilmîn civakî de mutlaqiyet nîn e. 2x2 her çaxî nabe çar. Li cem me Kurdan, her tişt reş û spî ye. Tişt baş an ne baş e, xweşik an ne xweşik e. Lî ji xeynî reş û spî, rengên din jî hene û di jiyanê de her tişt bi xeteke giştî; xweşik û ne xweşik naye kategorizekirin.

Daxwaz û uslûba me ber bi jiyanekê nû ve ye. Lî em heta bi qirikî di nav jiyan kevn de teqinî ne. Di şertên welatê me de welatparêzî, xwedîderketina mafen neteweyî jî bo herkesi rûmet e. Fejet em nikarin bi çandeke neteweyî an jî bi folklor gelêri xwe sînor bikin. Li dawiyê ev tişt lokal dimînin.

Gerek e em, ji pratika civakî ya sedsala 20'an dersên baş derxin. İro em dinîn ew îdeolojiye kûr û tûj ku li ser navê civakê an jî Xwedê derdiketin û reçeta xelasiya me nîşan didan, li ber pêlîn zemîn dikevin û di quncikekê de marjinal dimînin.

Tiştên ku niha di nav ronakbîrên me de têne nîvîsandin û axaftin berî bi 200-300 salî li nav ronakbîrên dînyayê dihatin munâqşekirin. Em di vê maratonê de bê taget man. Civak, dereng mabû. Niha hişê me tê serê me. Perdeya her tiştî, em ji ser hiltinîn. Lî her tiştên ku "di bin perdê" de pêşkêşî me dikin ne nû ye.

Haya me jê heye û em naxapin!

FERHENGOK

Abûb: Hincet

Caw: Qumaş

Çapegêrî: Çapemenî

Dagervan: Yê ku kar digerîne (Yöneten, çekip çeviren)

Ditbar: Vîzel (Görsel)

Don: Yax

Fendok: Fêlbaz, qurnaz

Hevrê: Heval, réheval

Hevrîsim: (İpek)

Hew: Qediya, xelas

Hew: Edî, nema

Kêlek: Qirax, kevî

Keskkesor: Qozeqer, heftreng (Gökkuşağı)

Kuncinandin: (Zedeleme)

OI: Dîn

Ola îslamê: Dînê îslamê (Islam Dînî)

Olan: Akîs (Yankı)

Parzûnandin: Daweribandin, palandin (Suzmek, süzül-mek)

Pêdaketin: Pê re eleqedarbûn, pê re mijûlbûn (Uğraşmak)

Pêjimar: Reqem (Rakam)

Rex: Alî

Robar: Çem

Rûpelraxistin: Mîzanpaj

Rûxandin: Hilweşandin

Şîlfik: Kêra bê kalan

Têger: Vegir, dirmî, perok (bulaşçı)

Terî: Dûv, boç, boçık

Terqîn: Belavbûn, peşkilîn

Tîprêz: (Dîzgîci)

Tîprêzi: (Dizgi)

Tiranê: Henek, ken, ironî (Alay)

Bangek li zimanperwerên Kurd!

Di dîroka me Kurdan de, yek ji mezintirin kemasî û gunehêne me jî ev e ku, me tu nîrx û qîmet nedaye xwendin û nîvîsandina zimanê Kurdi. Vê rexneyê divê em li xwe bikin û ji aliye gelên din û hevalbendên gelê me ve jî li me di be.

Heger me ji dîroka xwe derd û ibret girtibe, divê em vê valahiyê tiji bikin.

Dema ku em dibînin bîrayen me, xwiskîn me, kec û xortenê welatê me, gulêne taze bîskîvî yêng dayîkên me, li serê ciyan û di binê gelîyan de, di bin şertên dijwar de, ji bo rîzgariya gelê me, canda me, axa welatê me û hediya kirina zimanê me, xwîna xwe dirêjin û komeke bîcûk jî, ji rewseñbir û nîvîkarêne me di welat de, di bin êris û hovîtiyên dijmin de, fedakariyeke hêja di warê zimên de pêk tînin, divê em ji bi xwendin û nîvîsandin alikariya van hevalan bikin.

Berî demekê li bajarê Berlinê, tu kesî xwe berpirsiyarê rojnameya Welat nedidit, tenê bîst (20) heb "Welat" ji bo Kurdên bajêr dihatin û ew jî bas di nav hevalan de belav nedibûn.

Pistî ku me çend hevalan bi însiyatifa heval û nîvîkarê hêja Dilbixwîn hevkariya rojnameya Welat da ser milê xwe, me dît ku gelê me yêng bajarê Berlinê amade ne, bi zimanê xwe re mijûl bibin. Me heyâ niha bilî firotin 60 abone ji bo rojnameya Welat re kom kirine. Emê vê kampanyayê heyâ demekê bidominin.

Em ji hemû welatparêz, zimanperwer û xwendevanên "Welat" hêvi dikin ku, ew jî li bajarên xwe, li welet û li derveyî welât karê belavkirin, organizekirin û abonekomkirinê bidine ser milê xwe. Dîrûsmeaya me ev e: **Binivîse, bixwîne, bide xwendin.**

Berlin-Welat

Biratî

Ez û tu em hemû
Li ser reka dûr û bi dû
Mezrabota, Nemrut, Malabadi
Wek Rêcîka Hevrîsim
Dicle û Ferad di nav dayî
Cemşîd, Deysem, Ferîdûn
Serokwanê hebûna me bûn
Kawa, Şêx Seîd û Mezlûm
Ji bo me li dinê rabûbûn.

Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî,
Cegerxwîn
Mem û Zin, Gula Newrozê
û Binevş
Û wêkheviya dînyayê
Kasê zêran cihê şêran
Zilkerney aşıqê te bû
Xweyîtiya te xwestibû
Derbasê nav te nebû

1000 sal e li pey wan in
Cûn û hatin bi me dimîne
Geh ba qadi, geh ba miftî
Geh biratî geh bi astî
Dan bi destê wan em suclî
Self û benê nêhekî
Bûyê surê zalimdi
Dikis nakis naketi
Ew mehkema yekalî
Zimanê me kér diki

Dinya di qimayê 20
Ez û tu di 14. de
Qirnê peyk û fuze de
Em di roniya çira de
Gotin nîvî kar nake
Dibêjin Kurd tune ne
Hûn bê xîm in ji me ne
Zariyê jinbava me ne
Ji bîr dikin mîvan in
Mêvanê gelê me nin
Mêvanê zilm û zorê

Bes û temam ji destê we
Rom û Ecem û Ereb
Dengê zilm û zora we
Ji wir gîhiştîye ba Reb
Xort û kec û kalê me
Rabûne ser piyê xwe
Belavbûne li car alî
Azad dikin vî warî
Cûdi, Botan û Xerzan
Mêrdin, Amed û Batman
Di ciyê de û zindan
Dest dane hev tev biran
Wa derketiye roja ges
Bikevin pey lawê res
Agit Rahîm û Keles
Siheta we teva xwes

Fuat Urûn-Misirc

Çirayeke ronak

Li pêsiyê ez pîrozbahiyê pêskesi desteya nîvîkarî dikim û hemi hevparênen Welat, bi taybeti: sernîvisarê xwe yê dilsoz û qedî giran, ji bo dahatina Nûroza taze! Sersala me Kurdan cejna Welat pîroz be. Bi xêr û xebata we, gelê me vedijî û bi kiraseki zîndî dibe. Bi zar û zimanê bav û kalan, ciroka xwe dixwîne, ci bi serê xwe hatî û nehatî bi cavên serê xwe dibîne, ji bini ve bi baweriyeke mezin radibe û siwar dibe. Rojnameya Welat: weh cirayeke ronak e li ser Kurd û Kurdistanê, nîsan serfîzîyê ye. Weh mijde û mîzgîn e ji me re. Di tarixa rojnameyên Kurdan de, ez bawer na-kim ku tu rojname bi vê ciretê hatine xebatê!... Xebata di nava cerg û canê Kurdistanê de...

Xebata dilsozi, bi tenê keşîl e ku em bi ser kevin. Fedekariya bêtirs ew e ku dost û dijmin me teqdîr bikin... Derdê me û dermanê me, bi me re ye.. Ne li Ûris e... Ne li Amerika ye... Heqê me di nava lingê me Kurdan de winda bûye, gavâ em bi hev re rabin, evni heqê me bi me re radibe... Belê... Serefâ me, ew jî bilind di-be...

Careke din, pîroz be cejna we.
M. Dewran

Tirkiye hebûna xwe ya dagirker zexim dike

Komara Tirk, ji xeynî faaliyetên xwe yên leşkerî, bi giranî li ser zêdekirin û zexim-kirina avahiyên idarî yên dagirker diseke-nee. Li Kurdistanê kar û bar û avahiyên di warê idarî (qereqol, girtîgeh û hwd) de hatine pêkanîn û mesrefen lê hatine kirin, ji yên hemû warên din zehftir in.

Ercan Kılıç

Ji sala 1980 yên û vir ve. Tirkiyê li hember Têksonîna Neteweyî ya Rizgariya Kurdistanê li aliye-kî faaliyetên xwe yên leskerî gi-hande sewiya herî bilind. li ai-yekî jî. ji bo zeximkirina saz-gehênen xwe yên dagirker. kete nav hewldaneke mezin û di warê însakirina sazgehênen idarî de. mesrefen pîr mezin kirin.

Di weşana iştatistika însaetan a 1985'an de bajarêne mezin ên metropolê li ber yên Kurdistanê di warê mesrefa ji bo avahiyên idarî de li paş dimîlin.

Du avahiyên idarî yên hêjayî 378 milyon ji bo metropoleki wek Stenbolê hatiye plankirin.

Vêca em binêrin ji bo qere-qol û zîndanêne Kurdistanê çi-qas mesref di iştatistika 1985'an de. heye.

Ji bo 5 avahiyên Pirin (Adiyaman) 435 milyon. 334 milyon ji bo 6 avahiyên Bilisê. 150 milyon ji bo avahiyên li Erzorom. 898 milyon ji bo 3 avahiyên Mûş. 694 milyon jî. ji bo avahiyên idarî yên Sertê hatiye plankirin.

Li gorî raporê 1985'an EİD (Enstituya İstatistikî ya Dewletê) yên li ser sektora însaetan. li Kurdistanê 41.8 milyon ji bo 4233 avahiyen hatiye xerckirin.

(Bingöl) û wan tê. Zêdekirin û zükirina faaliyetên ku Komara Tirk di vî warê avahiyên idarî de pêktîne. diyar dike ku dewleta Tirk dixwaze li hember têksonîna Neteweyî ya Rizgariya Kurdistanê hebûna xwe ya dagirker biparêze. zeximtir û dorfirteh birke.

Avahiyên zîndan. qereqol û yên ji bo personelên leşkerî hetta niha herî zehf li bajarêne Sert. Bilis. Mûş û Sêwas. hatine çeki-rin. dû wan re bajarêne Mêrdin. Cûlemêr Batman. Çepekkür.

QEREQOL

Dever	Maliyet
Artvin / Şavşat	475 milyon TL
Çepekkür / Darahêne	385 milyon TL
Bilis / Navend	475 milyon TL
Bilis / Hîzan	430 milyon TL
Bilis / Mutkî	470 milyon TL
Bilis / Mutkî	450 milyon TL
Van / Gürpinar	450 milyon TL
Sêwas / Dîvrîgî	438 milyon TL
Sêwas / Gurûn	435 milyon TL
Sêwas / Şarkışla	380 milyon TL
Sêwas / Zara	385 milyon TL

GIRTİGEH (ZINDAN)

Dever	Maliyet
Wan	2 milyar 235 milyon TL
Mûş	5 milyar 550 milyon TL
Sêwas	5 milyar 550 milyon TL
Erzerom	2 milyar 520 milyon TL
Bilis	4 milyar 710 milyon TL
Sêwas / K.Hisar	670 milyon TL
Çepekkür	2 milyar 550 milyon TL
Mêrdin	1 milyar 990 milyon TL
Cûlemêr / B.Şebap	375 milyon TL
Mûş	3 milyar 975 milyon TL
Sert	7 milyar 850 milyon TL
Batman	3 milyar 120 milyon TL

Serpêhatiya îtîrafkarekî poşman

Girtiyekî li Zîndana Siwêregê teşebusî xwekuştinê kir, bi ser neket, dû re idareya girtîgehê ew şand Zîndana Amedê. Vêca daxuyaniyên komîk û hevnegirtî ji a-liyê idareya Zîndana Amedê ve hatin kirin. Pêşî gotin, girtiyekî bi navê Saît Kutlucan ji me re nehatiye şandin, lê dawî ji dan xuyakirin, ku Kutlucan li Zîndana Amedê peyda bûye.

Navenda Nûçeyan- Li Ru-hayê. li Girtîgeha Siwêregê îtîrafkarekî teşebusî intiharê kir.

Sînan Saît Kutlucan. ku di roja 16'ê Adara 1993'an de hatibû binçavkirin. ji polîsan re cihen gerîla dibêje. Li ser vê agahiyê. polîs êrisî ser star-geha gerîlayan dike û li wê derê 3 gerîla qetil dike.

Piştî vê bûyerê. Kutlucan ji aliye mehkemê ve. di 30'ê Adara 1993'an de tê girtin. Rojek sün ve. di 31'ê Adarê de. Sînan Saît Kutlucan li Girtîgeha Siwêregê. noteq dîniyîse û teşebusî intiharê dike. Di nota ku li pey xwe hiştiye de. ev gotin hene: "Ez tu feyde ji qanûnê poşmanbûnê hêvî na-kim. Incax gelê Kurd û PKK

dikarin min darizînin (mehkeme bike). TC nikare min darizîne." Piştî nîvîsina nota xwe Kutlucan. tiliya xwe dixe prîza cereyanê û dixwaze xwe bikuje. Dû re hevalen wî nahêlin Kutlucan. xwe bikuje.

Idareya Girtîgeha Siwêregê di daxuyaniya xwe de dibêje: "Me Kutlucan. ji bo tedawiyê rakir Nexweşaneya Dewletê ya Siwêregê. Dû re jî. me şand Girtîgeha Amedê."

Lê belê rayedarên Girtîgeha Amedê idia kirin ku. haya wan ji girtiyekî bi navê S. Saît Kutlucan tune û kesekî wisa ji wan re nehatiye şandin

Lê dawî. rayedarên Girtîgeha Amedê dan xuyakirin ku. S. Saît Kutlucan li girtîgeha wan e.

HAWAR

Dilbixwîn

Kopîkirina nivîskaran

Nîvîsa ku rexne lê neyê girtin û her kesê bixwîne serê xwe jê re bihejîne, rola xwe naleyîze. Ji lew re, rexnegirtin roleke mezin di pêşvexistin û xurtkirinê de dileyîze. Ji ber ku divê her tişt were guhertin û di cihê xwe de raneweste, sîng ji rexne û pêşniyan re vekiriye.

Min di Welat (hej.49), di quncikê Hawar de, nivîsekîli ser nivîskarêne Kurdistan li Swêdê nivîsandibû. Bi şeweyekî min ew "nivîskarêne" Kurd bi xwendevanê Welat dabûne naskirin. Li kîleka wê jî min hurmet û rîzdariya xwe ji nivîskarêne ku cihê şanazî û serbilindiyê ne, dabû diyarkirin.

Dema min ew nivîsa nivîsand, bê guman min dizanibû wê bi hinekan ne xweş were, ev ji tiştîkî gelekî normal e. Li ser her gewdeyekî seriyek heye, di her seriyekî de mejiyek heye, her mejiyek jî pîrsa li pêşîya çavan bi awayekî dinirxîne û şîrove dike. Ji ber vê yekê min nivîsa xwe nivîsand û Welat ji weşand.

Hevalê hêja Amed Tigris di quncikê xwe de (Pêñûs-Welat-Hej:54) di bin sernivîsa "Xwezi bi nivîskariya Swêdê an bi Tirkbûna Ewrûpâye?" nivîsek nivîsandiye. Di wê nivîsa xwe de rexneyan li nivîsa min digire. Li gor nîrîna rîzdard Tigris, diviyabû min bi wê şeweyê rexne li wan "nivîskaran" ne-girtiba û li şûna wê Tirkbûna Kurdistan Almanyâye bida ber ce-ka rexnekirinê.

Di serî de ez dix-wazim ji hevalê xwe yê hêja re bibêjim ku. babeta (mijara) min anîbû zimên û ya ku tu tînî zimên bi hev re nayê pî-vandin. du babeten ji hev cuda ne, her yekê mîzînekê wê ya taybetî heye, em nikarin bi mîzînekê wan bipîvin.

Mixabin li Swêdê nivîskarı bûye jêder û çavkaniyeke diravî, bûye aletekî bazirganiyê. Ne çavdêri, ne kontrol... û ne ji rexnegirtin. Bê guman ev meydana fireh nivîskarêne ku layiqî payebilindî û rîzdariyê ne dihêle di koşeya jibîrbûnê de, cihê dax û mixabinê ye.

tê nirxandin. Di vê çarçovê de ez wan nivîskar û weşanxaneyan dinirxînim. Lê birêz Tigris di nivîsa xwe de qala "Çend deranîne?" dike.

Mixabin li Swêdê nivîskarı bûye jêder û çavkaniyeke diravî, bûye aletekî bazirganiyê. Ne çavdêri, ne kontrol... û ne ji rexnegirtin. Bê guman ev meydana fireh nivîskarêne ku layiqî payebilindî û rîzdariyê ne dihêle di quncikê jibîrbûnê de, cihê dax û mixabinê ye.

Di rojekê de deh kovar û rojname ji dikarin werin weşandin, ev ne tiştîkî enteresan e, nayê wê wateyê ku, divê edî rexne lê neyê girtin. Na! Divê em bipirsin: Çima evqas rojname û kovar, çima evqas nivîskar û weşanxane, çima evqas tişt... û tişt?! Beramberî wê çend pirtûkxane hene, çend xwendevan hene...? Hevalê Tigris derî li van pîrsan venekiriye, tenê behsa navê kovar û rojnameyan kiriye. Ev valabûna di holê de danagire.

Di 1990'î de ji bo çekirina hevpeyvînekê ez li hozanê navdar Seydayê Tîrêj bûme mîvan. Min jê pîrsî: "Mirov çawa di be nivîskar, ji kî re tê gotin nivîskar?" Bersiva Seyda wiha bû: "Bi diploma û zanebûnê pîr mirov nikare bibe nivîskar, nivîskarî hestek e, êşek e, derdek e, girêdanek e tunde ye bi welat û gel re. Heçî kesê ku dikare çend rézan çêbîke ew ne nivîskar e, nivîskarî ne tiştîkî çêkî ye, bi vî awayî hozanvanî ji, çenabe, bi hestê re dikele..."

Li Swêdê çekirina nivîskaran heye, bi zimanekî din kopîkirina nivîskaran. Heke rî li pêşîya vê nexweşiyê neyê girtin, wê keleporda me, çand, tore û kultura me di destê çend bazigangan de têkeve kîfa mîzinê.

Pîrsî din ku birêz Tigris di quncikê xwe de anîye zimên, Tirkbûna Kurdistan Almanyâye. Koka vê nexweşiyê gelekî kûr e, nexweşiyekî dîrokî ye. Gelek aliye wê yên ku mirov bi kûranî li ser bisikine hene: Siyasi, sosyoloji, abori, psikoloji... û hwd. Di quncikê teng de nayê şîrovekîn, lêkolinêne fireh pîwest in. Lê bi kurtî mirov dikare di hejmareke din de nîrîna xwe bîne zimên.

Ermenî û Azerî dîsa bi hev ketin

Dijminatî û nexweşiya di navbera Ermenistan û Azerbeycanê de ya ji ber Qerebaxê ku ji sala 1988'an ve car caran xwe bi şerê germ dertîne holê, di van rojêñ dawî de dîsa veguherî şerê germ û didome. Rayedarêñ dewleta Tirk jî wek her car aligiriya xwe ya ji bo Azerbeycanê diyar kir û rexne li Ermeniyan girt.

Nûçeyen Derve- Dijminatî û nexwesiya di navbera Ermenistan û Azerbeycanê de ya ji ber Qerebaxê ku ji sala 1988'an ve car caran xwe bi şerê germ dertîne holê, di van rojêñ dawî de dîsa veguherî şerê germ û didome. Rayedarêñ dewleta Tirk jî wek her car aligiriya xwe ya ji bo Azerbeycanê diyar kir û rexne li Ermenistan girt.

Gelek kes û rayedarêñ Tirk, ji hikümeta Tirkîyê hêvi dîkin û dixwazin ku. Tirkîye ordiya xwe bi ser hêzên Ermenî ve bisîne.

Ev şerê germ roja 2'ê Nisana 1993'an di navbera van herdu gelên cînar de dest pê kir û heta niha gelek kesen sivil hatine kus-tin û serpeze mane.

Her du aliyen ser ji, bi êrisbirina ser hev hevûdin sûcdar dikin.


Li gor nûçeyen ajansên biyanî, di vi serê dawî de Ermeniyan bajarê Kelbejer xistiye destê xwe û li Qerebaxê ji hin korîdorêñ din ji xwe re vekirine.

Berdevkê Wezareta Parastinê ya Azerbeycanê da xuyakirin ku ev şer li bakurê Azerbeycanê dom dike û heta niha ji her du aliyen ji, pirr kes tê de hatine kuştin û mirovên wê herêmê di xeteriyê (tehlükê) de ne.

Rayedarêñ Azerbeycanê idia kirin-ku. Rûsyâ ji alikariya leşkeri dide Ermeniyan. Li aliyê din, hikümeta Rusyayê li pey lihevani-a Azerî û Ermeniyan e û têki-lyê bi her du aliyen re datine.

Nexweşiya heri mezin cara pêsi di sala 1988'an li ser Qerebaxê di navbera Ermenî û Azeriyan de xwe nîşan dabû û şer dest pê kiribû.

Ev dem teqabulê dema Gorbaçov dike û heta iro, ji 2500 kesi zedetir di vi şerî de canê xwe dane. Wisa xuya dike ku, ev ser û pirsgirêk wê hîna pirr dom bike.



Newroz li Hannoverê hat pîrozkirin

Hannover, Welat- Di roja 3.4.1993'an de şeva berxwedan, serhildan û azadiyê bi besdariyeke girseyî hat pîrozkirin. Dora pênc hezar şeniyen Kurdistanî ku li Hannover û derdorêñ wê bi cih dibin bi timtîlên neteweyî û bi dirûşmeyen mina; "Biji Newroz", "Biji PKK", "Biji Serok Apo" ... salon hejandin.

Programa şevê bi kîliyek rawestandinê li ser giyana şehîdan dest

pê kir. Axaftineke siyasi bi du ziman bi Kurdi û Tirkî li ser rewşa siyasî ya dawî hat pêşkêşkirin. Di na-va şevê de, ev hozan besdar bûn Sahîn (Zazaki) Besê, Seydxan, Peywan û Sefkan her wiha komên go-vendê Amed û Sîpan, bi listikên cihêreng şev xemilandin. Şano bi navê Kawayê Hesinker û Kawayê Hemdemî hat pêşkêş kirin, dema ku Hozan Sefkan helbesta "Roj Baş

Gerîla" pêşkêş dikir. Hêdi esmanen heftan dilerizîn, bi yek deng û dili pênc hezar dev bi hev re digotin: "Roj baş gerîla, şev baş gerîla". Sevê, bi germî û coşî xwe dirêji saet 11'an kir û bi govendeke gelêri fi-reh ji hêla besdaran ve hat dawiki-rin. Di vê şevê de, gelek dostên gelê Kurd ên biyanî besdar bûbûn, her wiha dezgehê ragihandinê yên Almanî ji hatibûn vê şevê.

GOTIN

Yaşar Kaya



Apê Seydo

L i welatê me li aliyê Ser-hedê, gelek kal û pîr, pis-por û zana hene. Gelekan jî seferbeglik dîtiye, çûn û hatina Ûris (Rûs) dîtine. Di nav ordiya Ûris de "MALAKAN" dîtine û piçek jî bi Ûrisî dizanin. Gundê me ji nêzîkî Agiriyê ye. Aliyekî Agiriyê, li deşta Rewanê dikeve, aliyê din ji li Bazidê, Suphanê û Çaldêranê dinêre. Serhed zehf xweş e, gîlî û gazinê me jî xweş in.

Carna xort li dora Apê Seydo li hev dicivîyan. Apê Seydo mirove-kî gelek zana û şer mer dîtibû. Tirkî hîn bûbû, eskerî kiribû. Hem zana bû, hem jî laqirdiyê xweş dikir, ji bo vê yekê, xortan ji Apê Seydo hez dikir. Hal û hîkayetê Apê Seydo zehf bûn, digot: "Ro-jekê ji Bazidê bi keran dihatime Îdirê. Ez hatibûm nêzîkî Qerebi-laqê, min guhê xwe dayê, min nêrî dengek ketiye erd û baniyan.

Yek koçê diajo, min wisa fêm kir ku, koçeve gelek mezin û direj tê. Min gazî kurê xwe kir û jê re got: "Loo bireve pêşîya keran koçeve mezin tê. Li ser vi çiyayê asê wê xwe li keran bixin. Ker wê ji rê derkevin, di vi zinarî de bikevin, êdî em nikarin derxin." Gede çû pêşîya keran, ez mam di xofê de. Deng her ku çû nêzîk bû, em ji newalê derketin em ci bibînin. Pe-yayek, gayekî barkirî, mankerek û

Li welatê me , li Îdirê qeh-wexaneya Apê Seydo hebû. Di wê çaxê de, di nav Îdir û Bazidê de qamyon, otobus tiştek tune bû. Wexta ku li Îdirê zebeş derdiketin, "Eşekçîya" (kerwana keran) li Bazidê wisa dibêjin, bi kerwanan dihatin Îdirê. Îdir zehf germ bû, kerwan bar dikir û êvarê diketin rê, berê xwe didane Bazidê.

têjikekî daye pêşîya xwe tê. Koça giran jî ew bû ku, deng ketibû erd û esmanan. Hat nêzîkî min bû. Min jê re got: "Kuro lawo te xêr e,

hore hora te ye ? Deng ketiye erd û esmên, hundirê min qetiya." Ji min re got: "Ez çawa bikim. Ev ji koça min e, koça herkesi anagora wî mezin e. "Wisa hêrsa min hat ku, ez hindik mabûm bibeecim. Min dest avête tebixa titûnê ku ez ji xwe re çixarekî bipêcim. Min dêhna xwe dayê kaxezê titûne tu-ne. Di wê wextê de yek mecidîye kaxez hebûn. Min ji hêrsan di mecidîye de titûnê pêçand û kişand. Paşê hêrsa min danî."

Li welatê me , li Îdirê qehwexaneya Apê Seydo hebû. Di wê çaxê de, di nav Îdir û Bazidê de qamyon, otobus tiştek tune bû. Wexta ku li Îdirê zebeş derdiketin, "Eşekçîya" (kerwana keran) li Bazidê wisa dibêjin, bi kerwanan dihatin Îdirê. Îdir zehf germ bû, kerwan bar dikir û êvarê diketin rê, berê xwe didane Bazidê.

Çiqas kerwana keran hebûn dihatin xana Apê Seydo. Di xana Apê Seydo de, hem ji xwe re laqirdiyê xweş dikirin hem jî li wê derê radizan û radiketin. Paşê barê xwe digirtin û diçûn. Van salên paşin, qamyon derketin, êdî ne ker mabûn di xana Apê de, ne jî ew civata xweş.

Civîna YKWK li Goteborgê

Goteborg, Welat- Li bajarê Goteborgê ci-vîna YKWK (Yekîtiya Karkerê Welat-parêzê Kürtistan) roja 4.4.93 çebû. Wek tê zanîn Goteborg bajarê Swêd e û di mezintiyê de bajarê duyemîn e. Di bajarê Goteborgê de 400.000 bêhtir insan dijîn û nêzî 800 kes ji wan Kurd in. Kar û xebatê ERNK û di vî bajarî de jî, di nav çend beşan de wek. YKWK, YXWK, YJWK, YCWK û hwd. didome.

YKWK ji biryara da-mezirandina komîta xwe girt. Ji bo di pêşer-roye de, di nav Kurdên ku li bajarê Goteborgê dijîn de, kar û xebatê xwe dombikin, di 10'ê Nisanê de jî wê civîna YKWK a navendî li Stockholmê çebibe.

Serokê Komela Mafêni Mirovan Akin Bîrdal 500 rojê koalîsyonê ji hêla mafêni mirovan ve nirxand

'Banga PKK'ê fersendeke girîng e'

Serokê Komela Mafêni Mirovan Akin Bîrdal bi civîneke çapegêriye (çapemeniyê) pêvajoya 500 rojê kaolîsyona DYP-SHP'ê di nav çarçoveya mafêni mirovan de anî zimên, rexenyê giran li vê pêvajoyê girt û jî bo çareserkirina pirsên mirovî û destpêkirina pêvajoyeke demokratik, banga PKK'ê wek fersendeke mezin nirxand.

Navenda Nûçeyan- Serokê Komela Mafêni Mirovan **Akin Bîrdal** bi civîneke çapegêriye (çapemeniyê) pêvajoya 500 rojê kaolîsyona DYP-SHP'ê di nav çarçoveya mafêni mirovan de anî zimên, rexenyê giran li vê pêvajoyê girt û jî bo çareserkirina pirsên mirovî û destpêkirina pêvajoyeke demokratik, banga PKK'ê wek fersendeke mezin nirxand.

Li gor Serokê Giştî yê KMM Akin Bîrdal, bilancoya 500 rojê koalîsyonê pêskêş kir û diyar kir ku. di vê pêvajoyê de yek gavek tenê nehatiye avêtin di riya mafêni mirovan demokrasiyê de û imaja Tirkîyê ne li hundir ne jî li derve hatiye guhertin.

Akin Bîrdal di axaftina xwe

de gote ku. her çiqas hewldanê hikûmetê bi mebesta guhertinê şıklî, çêbûbin jî, encam li ber çavan e û tiştek nehatiye gunertin.

Li ser van guhertinê şıklî Bîrdal, mînaka CMUK. Wazreta Mafêni Mirovan da û wiha domand. "Ci ji CMUK'ê dihate hêvî kîrin? Rêlibergirtina işkenciyê. windabûna di binçav de û bikaranîna xweparastin û darizandinê bû?

CMUK ne dihate wê maneyê ku wê rê li ber işkencê, windabûnana di bin çav de bê girtin û mafê xweparastin û darizandina adil bê bikaranin? Lê ev hêvî vala derket û tiştek ne guheri."

Akin Bîrdal pişti van gotinan bîlançoya mafêni mirovan ya 500 rojê koalîsyonê weke ku di tabloyê de tê ditin anî zimên.

Serokê Giştî Bîrdal, dû re bi avayekî dijwar ev îhlalkirinê mafêni mirovan û cinayet, bi rexne û protesto kîrin û bi giştî ji van kîrinê cinayet, işkence û zordestiyen xal, bi xal mînak dan.

Bîrdal bi giştî li ser wan kîrinê dijî mafêni mirovan sekinî: "Di vê pêvajoyê de zîlm û zora li ser komeleya me zêde bûne û endamên me yên wek Sidîk Tan. Kemal Kîlîc, Cemal Akar, Orhan Karaagâr, Metîn Can û Hasan Kaya hatînê kuştin. Hin endamên me bi mirinê hatine tehdîtkirin, hin jî hatine girtin û di binçav de ne. Şûbeyen me yên Amed û Sirnexê bi bombeyan hatine rûxandin û gelek şubeyen me yên din jî bi lêgerîna polîsan hatine serûbinkirin.

Di van 500 rojan de, pîrsîreka Kurdi: çareserkirina wê li aliyeke, hîn mezintir bûye. Li herêmâ ku Kurd lê dijin, 625 ci nayetên mechûl çebûne, 13 roj-namevan hatine kuştin, 400 gund hatine valakirin, hin gund hatine şewitandin û milyonek û nîv Kurd koçberi rojavayê Tirkiyê bûne."

Bîrdal, zerarênu ku şerê li Kurdistanê dide gel û dewletê bi pêjîmaran ifade kir.


"Sebebê enflasyonê bi giştî ji ber vî şerê herêmê ye. %52 wezifedâren ewlekariyê li Başûrêrojhelat û Rojhilatê ne. Nêzîkî 300 hezar lesker li vê herêmê ne û maliyeta her operasyoneke leskeri 13 trîyon e. Cerdevan, salê 3 trîyon distînin. Ji xeyni leskeran personelên

din, salê 3 trîyon tazmînatê distînin."

Akin Bîrdal da diyarkirin ku, di 600 rojê dawi de, li herêmê 1500 daweyêni siyasi hatine ve kîrin û 13 hezar kes hatine dari-zandin.

Serokê Giştî yê Komela Mafêni Mirovan Akin Bîrdal, a-xaftina xwe bi gotinê li jêr temam kir.

"Bi kurtî, li herêmê mafê jiyanê, mafê mirovan, hiqûk û demokrasî ji holê hatiye hildan. Banga PKK'ê serrawestandinê fersendeke girîng e ji bo guhertina vê tabloya tarî. Lazim e, ev bangâ PKK'ê bi serwextî û astî bê nirxandin. Bi vî awayê, wê riya vekirina pêvajoya mafêni mirovan û demokrasî bide destpêkirin."



Di 500 rojan de çareserkirina pîrsîreka mafêni mirovan li aliyeke, zîlm û zordarî zedetir bû.

Rewşa girtiyan xedar e

Navenda Nûçeyan-

Grevê birçibûnê yên li hin zindanê Kurdistanê û Tirkîyê hîn didomin. Pest û zordariya li ser girtiyan zêdê dibe û girtî ji bo rakirina vê rewşê li ber xwe didin.

Ev du meh in girtiyan Girtîgeha Amedê di greva birçibûnê de ne. Girtî bi sedema bidestxistina hin heqêni xwe û ji bo protestokirina êrîsêni rîveberiya girtîgehe ku, di bin navê "lêgerînê" de pêk dihatin, dest bi vê grevê kîrin bû.

Nûnerên girtiyan Girtîgeha Diyarbekirê **Bedrettin Kavak û A. Hakim Güven**, ji bo pesta (tahde) li

girtîgehe dibe ev tiş gotin. "Polis û leşkeren ku li vê girtîgehe ne, bi livbaziyan pro-vakatîf bi ser girtiyan ve diçin. Polis û leşker di spora sere sibehê de, bi sloganên qirêj û şoven diqîrin mîna

"Xwezî bi wî ku dibêje ez Tirk im," û hin sloganên bîratiya gelê Kurd û Tirk lê yên li dijî PKK'ê.

Car bi car jî keviran davêjin nav qawîşen girtiyan. Capeweniya Tirk jî cav û guhêni xwe ji van kîrinan redigire. Ev siîkatîya polîfîka ya dewletê ya ku li dijî gelê Kurd dimesîne ye."

Mebûsên Diyarbekirê Leyla Zana û Hatîp Dîc-

can didin kîrin û hwd...." Mebûs Leyla Zana û Sedat Yurdaş di dawîya lêkolinêni xwe de gazî raya gîstî, saziyên demokratik û wezaretî edaletê kîrin ku ji van kîrinê bêusûl, bêhayîdar û li hember wan bêdeng nemînin.


Li Girtîgeha Meletê, greva birçibûnê ya girtiyan gîhistê roja 40'an, 150 girtî dest bi vê grevê kîribûn û didomînin. Komela Mafêni Mirovan a Meletê, ji bo qedandina grevê dixebe, lê ji ber hin daxwazên girtiyan ku nehatin qebûl kîrin, grev jî didome. Girtî berî bi demekê dev ji hin daxwazên xwe berda bûn. Ji ber vê, rîveberiya girtîgehe hin daxwazên wan ên din qebûl kîrin. Lê belê gava girtî xwestin ku, her roj

karîbin qawîşen hev ziyaret bikin û karîbin jînên girtî bîbînîn, rîveberiya girtîgehe li hember wan sekinî û ev daxwaza wan qebûl nekir.

Bi vê abûbê (hincetê), girtî greva xwe domandin. Ji girtiyan, siheta Mehmet Topal geleki nexwes bû, ew ji bo tedawiyê sandin Stenbolê, 6 heb jînên girtî jî, ji ber ku tedawiyê Nexwesxaneya Dewletê qebûl nekirin disa ew sandin girtîgehe.

Girtiyan Girtîgeha Bur-sayê yên zindana bi sîklê E ku ji girtiyan PKK. Kawa û KUK'ê pêk tê, di 6'ê Ni-sanê de dest bi grevê kîrin.

Li Girtîgeha Bucayê, ji greva birçibûnê ya 75 kesan ku bi dorveger dest pê kîribû, hê didome.



Avaliyeke dîrokî: Dêra Zahferan

BINGEHA SÊ OLA MÊRDİN

Girîngiya Mêrdinê, ne ji kevnariya wê tenê ye. Mêrdin, di dîrokê de bûye bingeh û cihê sê olên mezin.

Ji ber vê yekê, her derên vî bajarî, mizgeft, dêr û nawîs in.

Zerduşti, filehtî û misilmantiyê li dû hev.

mirovê Mezopotamya Jorîn kirine bin bandora xwe. Her olekî ku dihat, heta xwe dida pejirandin,

gelek astengî û zordarî didit.

Ji bo vê yekê, mirovê têkilên wî olî, îbadeta xwe bi dizî (xefî) dikirin. Cihê îbadetê jî di binê erdê de çedikirin.

Ev nawîsên (mehzen) ku mîna Dêra Zahferan li ser wan hatine avakirin, ji wê demê mane.

Di wê demê de,

navê Mezopotamya ya Jorîn Tûr Abdîn bû. Navê herêmê iro jî, Tor tê derbaskirin.

Bingeha Dêra Zahferan jî, nawîseke dîrokî û kevnare ye. Dû re li ser vê nawîsê hin bi hin Dêra Zahferan a iro derkete holê.

CIHÊ DÊRA ZAHFERAN

Dêra Zahferan li rojhilate Mêrdinê cih girtiye. Bi pênc km. dûrî bajêr e. Başûr ne tê de, her sê aliyê din giş (tev) çiya ne.

Başûr rast e. Tev rez û bexçe ne.

Ji ber ku Dêra Zahferan navenda ola Suryanî Qadî maye. her sal bi hezaran mirovê herêmê û

biyanî têne dîtina wê.

Ci kesê ku riya wî/wê bi Mêrdinê dikeve. dice Dêra Zahferan dibîne.

NAVÊ DÊRA ZAHFERAN Û AVAKERÊN WÊ

Dêra Zahferan heta iro,

bi sê navan hatiye navkirin.

Mar Şleymun, Mar Ergîn û

Dêra Duwazdeh Hezar Ezîzan.

Li gor çavkaniyê Suryaniyan, nawîsa pêşî ji aliyê Rehib Mor Şleymun hatiye avakirin (Piştî Isa di sedsala çaran de).

Ji ber vê yekê navê yekemîn

Mar Şleymun e.

Li gor çavkaniyeke din, hestiyê rehibê Mar Ergîn, Mar Binyamîn ji Nisêbînê anîne û li vir binax kirine.

Navê duyemîn bûye Mar Ergîn.

Li hundirê Dêra Zahferan..

li cihekî taybetî hestiyê duwazdeh hezar

Ezîzen Suryaniyan hatine veşartin.

Bo vê yekê hinek, Dêra Zahferan bi navê Dêra Duwazdeh Hezar Ezîzan tînin ziman.

Navê Dêra Zahferan ji giyayê zahferan tê. Lewre ev giya li çiya û zeviyê dora Dêra Zahferan bi pirranî şîn tê.

Piştî Isa di navbeyna (navbera) 493 û 518'an de.

dêra ku bi aqir (qûbe), ji aliyê du bira, Teodos û Teodorî ve hatiye çekirin.

Piştî Isa di 607'an de. Dêra Zahferan ji aliyê Persan ve hatiye xirakirin. Lî dîsa ji nû ve ava bûye.

Mezelên (tirbên) 36 metropolit û

patrîkan li odayekê ji yê dêrê ne. Girîngiya Dêra Zahferan bi vê yekê hê jî bêhtir dibe.



Di qanûnê dadê (edaletê) de jî, bê guman aliyekî bêdad (bêedalet) heye.

Quintillionus

Qereqola Bavo

Demîrelê demogog, dema hîn nehatibû ser kar digot: "Îşkence ji bo dewletê şermeke mezin e. Pêwist e. em dewletê ji vê şermê xelas bikin. Heke em bêñ ser kar, em dê dîwarêñ qereqolan ji camê çêbikin." Hinek mirovan bi dil û can beweriya xwe bi gotinê anîn, hinekan ji pê tinazên xwe kirin. Ez heya niha di nav birra duymîn de bûm.

Lê wê roja han, riya min bi qereqolê ket, min şefâtiya qereqola Bavo dît, ez matmâyî mam. Ez çend carêñ din ji ketibûm binçav, lê min ew şefâti nedîtibû. Dera ez lê bûm mîvan. Emniyeta Mersînê bû. Ez heftekî li wir mam, min şefâtiyeke bêhempa dît.

Maşelah, li hember me navgînêñ îşkenciyê dixuyan. Em li beşike wek qawîş ên girtigehan, 15-20 mirov diman. Cihê em biliivin nîn bû, girtiyen adlî û siyasi tevlîhev bûn, zafê wan Kurd bûn, min hîn baş dît ku, mêtîngîhkar çawa mirovîn me ji kesatiyan wan dûr xistine, çawa ji mirovahiyê dûr xistine. Bi rastî ji, mêtîngîhkaran ji bo me Kurdan, yek rê hîstiye, ew ji riya serxwebûn û azadiyê ye.

Em disa bêñ ser şefâtiyê, îşkencekarek ji maseya diziyê hebû, mirovîk bi teknika îşkenceya xwe navdayî, teknika wî jê re bû bernav, jê re digotin: "Taşakçi Îbo" ew zat diket îşkencyen siyasiyan ji. Ew, xorkekî ji



navçeya Pirrîn ê, ji Semsatê ku sucê xwe dizî bû, bir navmala (ode) li himber me, ji hal de xist, anî. Çend kêlî derbas bû, hatin carek din birin, içar li eynî navmalê elektrîk danê.


Pêwist e, em hinekê ji li ser şefâti ya şubeya terorîst bisekinin. Tişte bala min kişand ew bû ku, şubeya terorîst ne ewqas şefaf bû. Dema mirov dibirin pîrsînê, çavê mirov girê didan, ji hev re digotin: "Xoce", "31", nizanim ci rêx, lêdana xwe ji li derek tarî dikirin. Şefâtiya şubeya terorîst ewqas kêm bû ku, em çav girêdayî derxistin himber bijîşk (Ez nizanim ew ci celeb bijîşk bû, belki beytar bû, yan ji sonda keran xwarîbû li dewsa sonda Hipokrat.) Dawî min seh kir ku, şubeya terorîst zaf ji qûna xwe ditirsiya. Ji lew re şefâtiya xwe kêm bû û ne layiqî şana Bavo bû.

Qeda / Stenbol

Jûjî....

Doğan Güzel

*JI ENİYA TÜRKİYE BERSNA ŞER-RAWESTİNÊ TE...



TİR

Musa Anter



Xelata sulha Kemal paşa

E v sê-çar sal in Tirk tiştekî ecêb dîkin. Dibêjin her-sal insanekî ku ji sulha dînyayê re xizmet kiribe emê xelata Kemal Paşa ya silhê bidin wî. Yanî dîkin ku bê xuyakirin Kemal Paşa gelekî silhperwer bû. Ma lawo emrê Kemal di mihareban de çûye. Hûn dibêjin di mihareba Çenekale de Kemal Paşa kumandar bû, 250.000 musulman bi emrê wî hatin kuştin. Belki ji aliye din ji ve ewqas. Miharebén wî xelas bûn, edî ket welatê xwe kes li ser lingan nehişt. Di roja teng de heçê ku alîkariya wî kiribû ya idam kir, ya sîrgûn kir û yan ji, ji Tirkîye berda wan. Mesela ji aliye sultanan de qerara idama wî dan reviya hat Kurdistanê. Wek artistan xwe kir musulman û Kurd û Tirk kirin birayêñ hev, soza namûsê da ku gawiran ji welatê xwe derxin emê dewletek Kurd û Tirkân çêkin. Rebenêñ Kurdan ji bi şêx û beg û axayêñ xwe ve li dora wî gihan hev. Civata Erziromê çêkirin paşê anîn Sêwasê civata wir ji çêkirin ji bo ku tişt pê neyê ji Erziromê heta Sêwasê, bi 500 siwari Hecî Bedir Axayê Kaxtî mihafeze kir. Paşê birin Enqere. Dora wî tevde Kurd û Çerkez bûn. Mesela li Sêwasê heft paşê hebûn yek jê Kemal Paşa bû, ez nizanim bê Cisnê wî ci ye, lê her şesêñ din Çerkez û Çeçan bûn. Mîrik hat Enqere cihê xwe girt lingê wî gihan erdê paşê çiqas yekê ku alîkariya wî kiribû giştik ya idam kirin û yan ji, sîrgûn û mihacir kirin.

Dibêjin Kemal Paşa gotiye: 'Di hundir de sulh û li derive suhl. Yanî Bi Tirkî "Yurtta Sulh, Cihanda Sulh". De binêrin bê ci derewen mezin. Ji 1925'an û heta 1938'an di Tirkîye de ne silh, herb hebû, Şêx Seid, Agriye, Zilan, Dêrsim û ya berê ji Koçgiri û yên din. Li derive ji halê me tune bû ku em bi kesî re şer bikin lê me li gora diranê xwe Sûriye dît me bi qirika wan girt, Sûriye dibêje Sancan em dibêjin Xatay. Me bi zorê ji wan stand. Mîrik mir yan ji, kî zane wê ci marifet bikirina. Pişti mirina wî bi 36 salan ve çêlikên wî ku dibêjin em kemalist in û serekê wan Ecevit hicüm kir Qibrîsê û stand. İste dîtinâ Tirkân a resmî ev e: Temamî wê li ser derewan hatîye çêkirin. Ku xelk bi wan dihisin û dibêjin ji yên hundir re yanî ji me re dibêjin "bolucu" û ji yên derive ji re dibêjin dijiminêñ Tirkân. Ma lawo kesî dîtiye ku ji dilê safi kes bûye hevalê neheqan. Hûn neheq in kurro. Tirkino!

Niha dibêjin emê xelata sulha ya Kemal Paşa salê bidin yekî. Erê. Adetek wiha heye. Her sal xelata artistan didin yekî, artistekî héja. An nîvîsarekî, dengbêjekî û resamekî ji, didin senetkarekî van işa. De iça tê ya sulha Kemal Paşa bidî kê? Par bi rastî û layiq dan Kenan Evren. Xem na-ke, ew wek hev in. Lî ïsal dibêjin emê bidin Mandela, yanî bi rastî melekekî sulhê yê qible yê Efrîqa ye. Ez ditirsim ku ev feqîr ji nezanî vê xelata ne di cih de qebûl bike. Xwezi berî kubihata Tirkîye ev nîvîsandina min bixwenda. Ez yeqîn dikim nedihat Tirkîye û ev xelata nexelat qebûl nedikir. Par cil milyon pereyê Tirkî ji bo vê xelatê dan Kenan Evren. Yanî Kenan Evren gelek xizmeta sulhê kiriye Xwedê qebûl neke.


Elhemdülillah her sal pereyê me nîvê bêhtir erzan di-bin. Belki ïsal bi şest milyon be. Lê ku ezîz Mandela ji nezanî van pereyê me yê bê qîmet qebûl bike ez yeqîn dikim ji wî şerefa xwe yê bêbuha wê gelekî winda bike.

Rayedarên dewletê di 7-8'ê Nîsanê de li Kurdistanê derketin seferê û soz û peymanê kevin tekrar kîrin.

Gera gel xapandinê

Navenda Nûçeyan- Serokwezîr Tirkîyê, bi hemû rayedarên sereke yên dewleta Tirk re. li Kurdistanê derketin seferê. Di vê seferê de. Demîrel dîsa wek her car behsa demokrasiyê kir. pesnê xwe û hikûmeta xwe da û waadêne mezin anîn zimên. Demîrel soz da ku, heta meha Hezîranê wê "Rêveberiya Taybeti" ji Kurdistanê rabike. Bes gotinê wî ji aliye gel ve cidi nehatin ditin. Wek tê zanîn, di destpêka avabûna hikûmeta koalisyonê de Demîrel gelel soz û peyman dabûn gelê Kurd û Tirk. lê heta niha tu problemen gel nehatine care-serkirin. Nexusim li Kurdistanê careserkirina pirsigirêkân li aliye, tevlihevî, zilm û zor ji berê ji zêdetir bû. Ji ber vê yekê wisa xuya dikir ku Demîrel bi xwe jî, ji gotinê xwe yên di geşta Kurdistanê de anîn zimên, bawer nedikir.

Serokwezîr dewleta Tirk Süleyman Demîrel û Cîgirê wî û sirîkê hikûmeta koalisyonê Erdal Înönü û hin rayedarên dewleta Tirk. ji bo du rojan li şes bajarê Kurdistanê gestek pêk anîn. Heyet li Culemêrg. Batman. Sîrnex. Sîrt. Mîrdin û li Amedê geriyan. bi gel re ji a-xaftinan cêkirin. Heyet li her derê li ser mijarê kar. huzûr, pêşvebirina herêmê ya aborî. li hemberî qanûnan wekhevîtiya herêman, li ser mijarê aborî û



Demîrel qala maten mirovan û demokrasiyê dike, lê di pratikê de ferqa wî û serokê leşkeriyê ji hev tune.

li ser rakirina "Rêveberiya Taybeti" rawestiyen.

Süleyman Demîrel û Cîgirê wî Erdal Înönü. di peyvîn û a-xaftinê xwe de bi pirranî li ser gelsên aborî rawestiyen. Car caran jî, bê navandina pirsigirêka Kurdî û bîryara PKK'ê

ya serraswestinê jî hin tistan bilêv kîrin. Lê bicihanîna van sozan jî, bi hin sert û mercan ve girê dan.

Li bajarê Amedê, di roja dawî ya gestê de Serokwezîr Demîrel wiha peyivî. "Ger bûyer û teşqeyen ku we aciz dikin.

Êrîşen dewletê dom dikin

Navenda Nûçeyan- Di operasyonê ser gundê Mehsertê (Omerli) de, gundê Sêxmehmûd, Xirbemamîte, Kevarêxê, Metina, Yestê, Kermêtê, Xirbêbelik, Bêrtê, Kafsenor. Sadra û Riswanê ji aliye hêzên leskerî û cerdevanan ve hatin talankirin û bi dehan gundi hatin birîndarkirin. Ev operasyonê ser gundê Mehsertê, di 31 Adar 1993'an de dest pê kîrin. Hemû qût û pereyê gundiyan ji aliye lesker û cerdevanan ve hatin talankirin. Pez û dewarê gundiyan an hatine kustin. an ji guhanê wan jêkirin. Televizyon, sarinc (dolabên cemedê), derî û paceyê avahîyê gundiyan hatin sikan din. Hin gundiyan dane ber gulleyan. li hin ji wan jî, îskence kîrin. Bi dehan gundi xistine binçay. Li jin û kecîn gundiyan heqaretê kîrin û heftiyekê qewl dane wan ku, gundê xwe vala bikin.

Gundiyan Metina; Tajdin Akin, Huseyin Aras, Yasar Das, A.Rahman Akyol, İbrahim Adibe li, Ahmet Adibeli, Ehmet Akgülle

Bahadin Kokel ev agahî dane nûcevanê Yeni Ülke; "Gerilayên PKK'ê, li nêzî gundê me konvoyeke leskerî xistibûne kemînê. Di vê kemînê de 5 lesker û cerdevanek hatibûn kustin. Piştî vê bûyerê, hêzên leskerî bi ser gundê me ve girtin û êzingên me, pûten (êmîn) sewalê me û qûtê me yên zivistanê îmha kîrin. Gelek ji gundiyan me ji bi xwe re birin. Li ser vê yekê, em wek heyetekê cûne cem Qeymeqamê Mehsertê, lê li me guhdarî nekir. Me berê xwe da cem qumandarê jendirmeyan. Wi jî, ji me re gote ku ev yek bi fermanê min dibin. Divê hûn di nav heftiyekê de gundê xwe vala bikin. Me jê re got ku em nikarin gundê xwe vala bikin.

"Pistî ku PKK'ê ser rawestand, hêzên dewletê operasyonê xwe zêde kîrin. Niha ji berê zêdetir, erisi ser gundê me dikin".

LI PASÛRÊ 100 BINÇAVÎ

Li navceya Diyarbekir. Pasûrê

di nav heftiyekê de 100 kes hatine girtin. Ji van girtiyan, der mafê 2 kesan de tu agahi nayê girtin. Harbi Kaya (17) û Orhan Deniz, bi hinceta ku nûce gihâdine rojnameya Yeni Ülke hatine girtin. Lézimên van herdu kesan.

Mahmut Kilînç li dij gera Demîrel û Kurdistanê bangî gelê Kurd kir:

Guhê xwe nedin Demîrel

Navenda Nûçeyan- Roja 7'ê Nîsanê, mebûsê Partiya Keda Gel, Mahmut Kilînç di a-xaftina xwe ya di parlementoye de, bala gelê Kurd kîşand ser gera Demîrel. Înönü û ji gelê Kurd xwest ku, guhê xwe nede gotinê rayedarên dewletê û ji wan bawer neke.

Li gor Mahmut Kilînç, hikûmeta koalisyonê pêvajoya astiyê ku, berî demekê li Kurdistanê dest pê kîrie, ihmâl dike, tewrên xwe yên anti-demokratik didomîne. Kilînç gotinê

tekrar nebin, ger teroristên ku li çiya ne dev ji kustina mirovê mehsûm û bêrî berdin û xwînê nerijînin, wê rêveberiya taybeti di meha Hezîra nê de ji holê rabe."

Her ciqas bi bîryara PKK'ê ya şerrawsetinê hin hêvî û meferên careya siyasi ya ji bo pirsigirêka Kurdi hatibin afirandin jî, rayedarên dewleta Tirk. xwe nêzîkî hevditîn û hevrûniştinê siyasi nakin. Ev gavênu ku diavêjin jî, bi sertan ve girê didin û li meseleyê jî, bi çavekî aborî dinêrin.

Cîgirê serokwezirê dewleta Tirk Erdal Înönü ji, di axaftina xwe ya li bajarê Sîrtê de. li ser sozên ku dema hîn nû hatibûn ser kar dabûn. rawestiya. Înönü: "Sala cûyî me hikûmetê ilan kir. me got ku em nasnamaya Kurdi qebûl dikin. Niha ji em van sozên xwe, dixebeitin ku bînîn cih. Ger ev sozên ku me dabûn bi derengî ketibin jî sebeb teror e. Bînérin hem Newroz û hem jî meha Remezanê bê xwîn derbas bûn. Hikûmet me ci soz dabin wê werin cih." got.


Ev geşta du rojan a hikûmeta koalisyonê, ji bo hînbûna nîrenîn gelê Kurd pêk hat. Li gor daxwazên gelê Kurd û nîrenîn wan ên der barê pirsigirêka Kurdi de, hikûmet dixwazê bersivek bide bîryara serrewestinê û daxuyaniyen Se-

nizanin ku zarokên wan li ku derê ne. Dema ku ji leskeran di pirsin jî, lesker ew tehdit dikin.

LI XERZANÊ HÊZEN DWELETÊ

Li navceya Bilîsê Hîzan. Motki û Gelyê Sêx Ciman hêzên dewletê bi alîkanya cerdevanê li hember gerilayen dest bi operasyoneke gisti kîrin. Li gor agahi-

yan, heta niha 15 timên taybeti, 20 lesker û cerdevanek birîndar bûne. Ji gerîla ji 2 kes bi saxi ketime destê hêzên dewletê. Lesker û timên birîndar, li nexwesxanya Bilîsê radîkevin. Serbazek nehistiye ku, tedawiya cerdevanê birîndar bêkîrin. Serbaz ji bo vê yekê ji wiha gotiye: "Tedawiya van xayînan nekin. Dibe ku sibê berê cekêne xwe bidin ser me ji".



Mebûsê HEP'ê Mahmut Kilînç

Lê ger axaftinê Serokwezir Demîrel, ger Cîgirê wi Erdal Înönü û ger ji daxuyaniyen Serleskere Tirk Doğan Güres, di din xuyan ku, dewleta Tirk naxwaze bi awayekî siyasi li meseleye binêre. Nêrina wan, bi awayekî aborî xwe dide nîşan.

Heta di gesta xwe de li her bajarî behsa pêşvebirina wî bajarî kîrin, ji bo ku bajar, ji aliye aborî ve bi pês ve here, sozê ku ci ji destê wan were dan. Gelê Kurd ên herêmê jî, ji heyetê beriya her tistî seqirandinê, hizûrê û dû re derfetên kar û xebatên ji wan xwestin.

Süleyman Demîrel ji, ger di axaftinê xwe de yên ji bo gel û ger ji di bersivê xwe de yên ku rojnameger je pirsibûn sozên ku dida hemû bi sert bûn.

Li Sîrtê Demîrel wiha peyi: "Dema rêveberiya taybeti rabe. Edirne çawa were idarekirin wê Sîrt ji wisa bê idarekirin. Ez dizanim hûn xizmetê dixwazin. Lê heta ku teror hebe, xizmet pêk nayê."

Geş di roja heftê meha Nîsanê de, bi besdariya Serokwezir Süleyman Demîrel. Cîgirê wi Erdal Înönü, serleskerê dewleta Tirk Doğan Güres û hin rayedarên dewleta Tirk ve, dest pê kir. Ev ger dû roj domiya û roja hestê mehê li bajarê Amedê bi civînekê qediya.

Serokê YNK'ê Telabanî hefteyek li Tirkîyê derbas kir:

'Divê Tirkîye jî hin gavan bavêje'

Serokê Yekîtiya Niştimanî Kurdistan (YNK)'ê Celal Telabanî, ji ìna heftiya çûyi ve (2.4.1993) li payitexta Tirkîyê bi serokê partiyên Tirk û rîveberên dewletê re serdan û hevdîtinên girîng pêk tîne. Celal Telabanî, bi giştî li ser -şerrawestinê ya ku PKK heta 15'ê Nisanê yekalî ilan kiribû disekine û ji bo dewleta Tirk jî, hin gavan bavêje dîtinên xwe pêskêşî rayedarên dewletê dike.

Navenda Nûçeyan- Celal Telabanî, piştî serdanen xwe yên Amerîka û Îngilistanê, hate Tirkîyê û pêşî bi Serokkomarê Tirkîyê Turgut Özal re, dû re jî bi Serokê Meclisa Tirk Hüsamettin Cindoruk. Serokwezir Süleyman Demîrel, Cîgirê Serokwezir Erdal Înönü û Serokê CHP'ê Deniz Baykal re hevdîtinan pêk anî. Celal Telabanî, wê di 10.4.1993'an de jî bi endamên Mêcîsa Partiya Keda Gel (HEP) re beşdari xwarinekê bibe.

Serdana Celal Telabanî ya Tirkîyê, di rojname û televizyonen Tirk de, bi a-wayekî fireh cih digire. Di

civîn û roportajên ku bi Celal Telabanî re têne kîrin de, bi giştî li ser şerrawestinê PKK'ê tê sekinandin û rojnamevan ji Celal Telabanî, sedemên serdana wî dipirsin. Celal Telabanî di beyanen xwe de diyar dike ku, ne ji bo navberiyê hatiye Tirkîyê. Lî çapemeniya Tirk, vê peywira Celal Telabanî hê ji serî ve ilan kiribûn û pişî van beyanan jî, dev ji idayen xwe bernedan.

Serokê YNK'ê Celal Telabanî, li ser şerrawestinê dîtinên xwe bi kurtî wiha tîne zimên: "Divê mîjuya şerrawestinê dirêj bibe.



Telabanî hefteya ku li Tirkîyê derbas kir bi gelek rayedarên dewletê re rûnist û têkili danin.

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, di vê biryara xwe de samîmî ye. Divê Tirkîye jî, hin gavan bavêje. Xala herî girîng, dirêjkirina mîjuya şerrawestinê û pa-

rastina aştiyê ye. Dema têkoşna demokratik bikeve rojevê, pêdîvî bi têkoşna çekdarî namîne. Li Tirkîyê herkes ji vê aştiyê û sekinandina rijandina

xwînê bextewar e. Divê ji iro pê ve, têkiliyên PKK'ê yên bi rîexistinê Kurd re xurttir bibe û PKK li hember gelê Tirk bi zimanekî din biaxive".

Danezana HEP'ê


Ji bo ku dewleta Tirk metodên xwe yên berê nedomîne û destê aştiyê yê PKK'ê dirêjî gelê Tirk kiriye, bê bersiv nemîne, PKG (HEP) danezaneke ji 14 xalan belav kir.

Navenda Nûçeyan- Partiya Keda Gel (HEP) danezenek (bildiri) ku ji 14 xalan pêk tê, da Serokê YNK'ê Celal Telabanî, saziyên demokratik û balyozxaneyan. Di danezanê de tê diyarkirin ger bê xwestin. HEP kare navberiyê bikê û ci ji destê wê bê di vî warî de pêk bîne. Tê xwestin ku, biryara serokê PKK'ê Abdullah Öcalan a şerrawestandinê (20 Adar-15 Nisan) fersendeke bas e, ji bo careserkirina pirsgirêka Kurdi.

Danezan ji van xalan pêk tê:

- Li gorî sosyolojiya Tirkîyê, nasîna nasnameya Kurdan û qebûlkirina wan li gor qanûnê esasi.

- Li gor peymanen GîK û sertê Parîsê, careserkirina



her deverê bi awayekî wekhev were tetbiqkirin.

10. Divê qanûneke adil a hilbijartînê bê cêkirin.

11. Divê gund û bajaren ku hatine şewitandin û xera-kirin bêne imarkirin û zerarê xwediyê wan bê tazmînki-rin.

12. Divê ji bo bi pêsxistina aboriya heremê dest bi xebatan bê kirin.

13. Gund û bajaren ku navê wan ji Kurdi wergerendibûn Tirkî, divê dîsa bikin bi Kurdi.

14. Divê dev ji planê "Hereketen Hundîrîn" û Operasyona Biharê" bê berdan.

Midûrê Emniyeta Edenê:
'Em dev ji qanûnan bernadin'

Navenda Nûçeyan- Midûrê Emniyeta Edenê Mete Altan dev ji bêdengiya xwe ya li ser bûyeren Newroza li Edenê berda. Midûrê Emniyeta Edenê Mete Altan bi daxuyanekê bûyeren Newrozê nirxand û bi tenê xwe ji birîndariya yekî berpirsiyar girt.

Partiyen siyasi, sendika û Rîexistinê Girseyî yên Demokratik ên li Edenê, berpirsiyare teşqe û bûyeren Newroza li Edenê. Midûrê Emniyeta Edenê Mete Altan dibînin. Di bûyeren Newrozê de hêzên dewletê, bi bombevê gazê û hîstir-rijandinê, jop dar û tivingen sacme-avêj êrisî gel kiribûn. Di êrisê de du kes hatibûn kustin û nêzîkî sed sed kes jî (ses jê bi xedârî) birîndar bûbûn.

Midûrê Emniyeta Edenê Mete Altan, civîneke çapemeniyê çekir û bûyeren Newroza

xwîndar nirxand. Altan, "Me tu kes nekustiye û birîndar nekiriye. Tenê yek mirov ji aliye me ve hatiye birîndarkirin. Ramazan Çetîn ji diwar de ketiye û Nêzîr Kort ji sebebê mirina wî nehatiye zanîn, mirine" got.

Mete Altan bi berdewamî li ser bûyeren Newrozê râwest û wiha gotinên xwe domand: "Ez ne ji bo imtihanê hatime Edenê. Armanca min ku ez peywîren xwe bînim cih. Lî tu carî, ji qanûnan tawiz nadim," got.

Midûr Altan got ku di bûyeren Newrozê de pêcîkên hin kesan tê de heye û gel pêskari wan hatiye kirin. Altan li ser vê ji wiha peyvi "Serokê partiya illegal dibêje ku me sileh daniye, lê ji ber ku ew sileh datinin, emê qey dev ji qanûnan berdin."

PÊNÛS



Amed Tigris

Argotên Kurdî

Argot, gotineke Latinî ye. Di hinek zimanên Ewrûpî de, jê re slang ji dibêjin. Tirkan tipa "t" avêtine û "argo" dibêjin. Gotinên argot ji kultura nizm tê. Lê, gotinên argot wiha ketiye nava xelkê ku ew bûne gotinên rojane. Argot êdî parçeyek ji jiyana rojane ye. Mirov nikare bê argot literaturê bifikire. Gotinên argot bûne wek xwê û beharata literaturê. Gotinên argot ne ku hindava (sewiya) literaturê û kulturê dadixe. Berevajî bilind dike. Wê dewlemend û rengîn dike. Gotinek, dikare cihê pirtûkekê bigire. Mirov dikare bibêje argot zimanê gel e. Ev di her zimanî de wiha ye. Gotinên argot li gor wextê zû têñ guhartin. Di demeke kurt de dikarin ên kevin winda bibin an jî bêñ jibirkirin. Di şuna yêñ kevin de, ên nû derdi kevin holê. Yani argot ji li gor dem û teknikê zû têñ guhartin.

Di ziman û literatura Kurdî de ji, argot gelek xurt e. Lê hezar mixabin wek cureyên din ên literatura Kurdî, gotinên argot ji nehatine berhevkirin û nivîsandin. Ji ber vê yekê, argotên me ji herêmi mane. Kêm ji wan bûne malê gel û li seranserê Kurdistanê têñ bikaranîn. Piranî her yek di herêma xwe de, têñ bikaranîn. Ji ber vê yekê ji ew nebûne malê gel û bi gişti li her derê welat belav nebûne. Haya herêmek ji argotên herêma din tune ye. Herkes argotên herêma xwe dizane. Heta yêñ herêmén din dema dibihîzin, bi wan henekan dîkin û dibêjin. "Ma ev jî gotin e? Kurdiya we ne rast e. Ya rast Kurdiya herêma me ye..."

Ez dixwazim ji argotên Kurdî çandan li jêr binivîsim:
– De bicirine lo! Yani cihê te fireh e, heta dikarî derewan biker...

– Milê apê xwe bade, pereyê wî pirr e. Yani fen lê bike, wî bixapîne.

– Min qûna Hikmet Çetîn da bayê. Yani min hemû derew û pianên wî derxistin der. Her tiştên wî eşkere kirin. Ew têk çû.

– Bi Xwedê ez rabim ser xwe, ez dê ser û çav li te çebikim. Yani ez dê te birîndar bikim. Ez dê te rezîl û riswa bikim...

– Kuro dîsa binfisiyan neke. Bi awayekî vekirî û camêri bibebe.

– Ez heso Kurd im. Yani ez Kurdeki xas im.

– Here ber çem qûna xwe bişo lo! Yani tu nikarî xwe ji vî karî pak derxîni. Tu ji xwe re bibêje. Kî ji te bawer dike?

– Dev jê berde, ew mirovekî tiro viro ye. Yani mirovekî ku ji tişteki re nabe. Bê rûmet û bê şexsiyet e...

Ji bo pêsketin û dewlemendiya zîmân û literatura Kurdî berhevkirina argotên herêmi kareki gelek girîng û pîroz e. Wek berhevkirina hemû cureyên gotinan, me heta niha girîngî nedaye berhevkirina gotinên argot ji. Bi dîtin û baweriya min, berhevkirina karê folklorik ji nivîsandina meqale, roman û çirokan aciltîr e. Ji ber ku kal û pîrîn me her roj dimîrin. Bi mirina wan re, her cureyên folklorâ Kurdî ji dimîrin û dikevin bin axa welêt. Heger me ji demek zû, ve berhemîn folklorik berhev bikira dê niha pirtûkxaneyeke me ya mezin û dewlemend hebûya. Ji ailiyê din ve, dagirkeren welatê me bi dizî wan berhev dîkin û bi zimanê xwe dinivîsinin û ji xwe re dîkin mal. Em ji bi zimanê wan dixwînin û heta derecyekej ji qebûl dîkin ku berhemîn wan in.

Berhevkirina berhemîn folklorik gelek girîng û pêwist e. Divê di demeke kurt de, ew bêñ berhevkirin. Her kesê ku destê wî wê pênuş digire di her warê folklorik de wek stran, gotinên pêşîyan, mamik (tîstanok), lihevhatî, biwêj (deyim), lîstikîn zarakan, stran, dua, nifir, argot û hwd, berhev bike û ew li navendekê kom bike.

Ziman û literatur, bi kar û barêñ wiha pêş dikeve. Kultur, bi berhemîn wiha winda nabe û dewlemend dibe. Ev ji ne xizmeteke biçük e. Xizmeteke mezin û pîroz e. Dê hêz bidin û rabine ser xwê lo! Qûn li we bûye wek palas, hûn êdî nikarin ji cihê xwe ji rabin malxerabno!

Amadekarê Ferhenga Kurdî-Îngilîzî Baran Rizgar: 'Yekîtiya zimêñ armanca me ye'

Ali Manaz

LONDON- Mehek berê li Îngilîstanê mamosiyê Kurd **Baran Rizgar** du pirtûkên nû çap kirin: "**Ferhenga Kurdî-Îngilîzî Îngilîz-Kurdî**" ji bo kesen ku bala wan li ser Kurdi û Îngilîzî heye: "**Dersêñ Kurdî**" Ji bo Kurden ku bi Türk dizanin lê bi Kurdi nizanin, an Kurdiya wan ne bas e, an ji ên ku dixwazin Kurdiya xwe pêşve bibin û mamosiyâ Kurdi bikin hatiye nivîsin. Em li Londonê bi mamosite Baran re peyivin û me li ser van xebatan bi kurtî nêrinêñ wî pirsin.

Baran Rizgar, ev 5 sal in, li Londonê dimîne û ev herdu pirtûk keda wî ya 5 salan e. Wî ji bo amadekirina ferhenga xwe 300 pirtûk, kovar û rojnameyên Kurdi kolandiye û ji wan 15.000 peyvîn Kurdi berhev kirine. 10.000 peyvîn ji jiyana rojane berhev kirine ji, kirine ser û hejmara peyvikan gîhandiye 25.000 an. Dûre ev peyv analîz kirine û hemberiyêwan ên Îngilîzî kolandiye û ji wan 20.000 peyvîn herî girîng berhev kirine. Pasê ev peyv analîz kirine û hemberiyêwan ên Kurdi nivîsine. Mamoste ev herdu bes wek du pirtûkên cûda amade kirine, lê ji ber imkanîn aborî wek yek pirtûk cap kirîye.

Metoda Baran Rizgar a leksikografîku di ferhengê de bi kar anîye û bi tevayî naveroka Ferhengê di nav der û dora Kurdolog û aqademisyenêni bi Kurdi re eleqedar pirr zû dengda. Zahfe wan ji wî re pîroznamê sandin û hema tu bibêji gîsa ji wan ji ferhengê siparis kirin. Xuya ye ku, ewê di nav xwe de pirr minaqese bikin û di kovar û rojnameyên xwe de li ser binivîsin.

DERSÊÑ KURDÎ

Pirtûka wî ya bi navê "Dersêñ Kurdî" ji gelek hêlêñ xwe balê dikisine û pirr tê ecibandin. Ew di vê pirtûkê de reziman, ferhengok û bilêvkirina Kurdi li ser bingeha nivîsar, diyalog, cirok, metelok û hîndariyan (legzersîzan) tetbiq dike. Pirtûk encama mamosiyâ Kurdi ya car salan e. Di hînbûn û hînkirina Kurdi de pêkanîna sistemekê armanciye. Du armancen vê sistemêng bingehîn hene. A yekemîn ew e ku bi vê pirtûkê kesê ku qet bi Kurdi nizanibe bikaribe xwe bi xwe bi Kurdi hîn bibe. A du yemîn ji bo mamosiyâ Kurdi



"Divê em welatekî Kurdiyaxêv (Kürte konusun) arranc bikin." Mamosiyâ Kurd, Baran Rizgar dîbêje ku têkoşina ziman li gora têkoşina leşkeri û siyasi bî paş ve maye û ev ji me Kurdan re dezawantajeke mezin e.

programmek e. Yeki ku Kurdiya wî ne pirr baş be, an ji xwendin û nivîsina wî ya Kurdi tune be ji dikare ji vê pirtûkê istifade bike. Di pirtûkê de ji bo armancen ditbar (visul) 300 ilustrasyon (wêne) ji hatine bikarîn.

Hem di pirtûkê de û hem ji di ferhengê de, istatistikên li ser dengen Kurdi ji hene. Ev cara pêşin e ku, li ser pirrcariya dengen Kurdi ewqas bi firehî istatistik tê cêkirin. Li ser 72.521 dengen Kurdi istatistik cêkiriye û bi tablo û grafikan pircariya (frekansa) dengen

manci kiriye. Wî bi ferehî ji me re têkiliyên di navbera ziman, cand, dîrok, abori, welatbezî û sexsiyeta kesan û civakan de rave kirin. Lê pirr mixabin cihe me tune ku, em wan peyvîn hêja gîsan binivîsin. Wî ji ev sedem xwes dît û bi kurtî wiha got: "Dijmin tenê bi leskeri erîsi Kurdan nekiriye û nake, ew her wiha di warê ziman, cand û dîrok de ji erîsên xurt tînîn û anîne û ewê hîn bînîn ji. Bê guman me ji heta niha xwestîye ku tenê bi leskeri lê di her warî de li ber xwe didin. Lê pirr mixabin van 10-15 salen dawî li Kurdistana Bakur berxwedana ziman hat ihmalkirin. Wan ji erîsên xwe xurttir kirin. Kurdiya min zikmakî ye. Türkî û Îngilîziya min ji bas e. Min dît ku, ez li ser ziman dikarim bifikirom, lêkolinan cêbikim û tistinan biafirînim. Min got ku bastir e ez di berxwedana ziman de cih bistînim. Ev 5 sal in min ev kar kiriye armanci jiyanâ xwe. Berê devê lûla tivinga gerîla û serê gêca (tebesîra) mamosite bi eynî derê ve ne."

Me ji Mamosite Baran Rizgar xwest ku, bi kurtî li ser zimanê Kurdî bipeyive, lê wî wiha got: "Li ser pirsên zimanê Kurdî bi kurtî nayê peyivin, bi ferehî tê peyivin. Heke hûn hez bikin em dikanin careke din bi ferehî bipeyivin."

Me nêrinêñ wî yê li ser Welat jê pirsî wiha got: "Welat, wek rojnameyeke xwerû Kurdi gavek e, gaveke girîng e. Di kar û barê xebatkarêne wê de serketin û serfirâziyê hêvî dikim. Lê divê ev gav pêsvetir bice. Ewê ku nêvi Kurdî, nêvi Türkî derdixin zêde nakevin serê min. Ji ber ku wê gavê, xwendevan besa Türkî dixwînin."

Navîşana xwestînê:

45 Wilmot Close, Peckham Hill St., London SE15 6TZ

Li Swêdê panela ziman û edebiyata Kurdî

'Di edebiyata Kurdî de rexne tune'

Yekîtiya Rawşenbirênen Welat parêzêne Kurdistanê besa Swêdê di roja 4.4.1993 an de li Stokholmê bi navê "Di pêsketina ciyatê de rola ziman û edebiyatê ci ye?" panelek çekir. Mirhem bi rëzgirtina şehidan ve civîn vekir û li ser girîngî û pêwistîya zimên û edebiyata Kurdî rawest. Di soreşa Kurdistanê de, girîngî û girêdana zimên û edebiyatê da diyarkirin.

Serefhan Cizîri panel idare kir. Dagervanê panelê Serefhan Cizîri, panelist dan nasîn, rojev û prensibêne panelê diyar kirin. Kesên besdarêne panelê nivîskar Mehmed Uzun, Rohat, Firdâ Cewerî û helbestvan Mahfuz Mayîbûn. Panel ji sê besan pêk hat. Di besa yekemîn de hinek panelist parçeyek ji berhemên xwe xwendin. Besa duyemîn li ser pirsên Serefhan Cizîri panelistan der heqê pêsketina zimên û edebiyata Kurdî de, li gor pirsên wi bersiv dan. Beşa sêyemin ji guhdaran dîtinêne xwe gotin û rexneyêne xwe anîn zimên.

Serefhan Cizîri bi van pirsên jîrîn dest bi beşa duyemîn kir:

1. Li welatê me dema behsa edebiyatê tê kirin, carnan propaganda tê bîra mirov. Gelo ferga edebiyat û propagandayê ci ye?

2. Tu ji bo ci û ji bo kêt dinivîsi? Tu di berhemên xwe de bangi kijan cîn û tebeqeyî dikî?

3. Ji bo xwenaskirin û perwederaya neteweyî rola edebiyatê ci ye?

4. Li gor rewsa ku iro Kurdistan tê de ye, divê nivîskar mi-jarêne cawa hilbijêre?

5. Di dema nivîsandinê de, gelo nivîskar cîqas cih dide hîs û sexes xwe?

6. Ji bo pêsxistina zimên û edebiyata Kurdî mirov dikare ci bîke?

Rohat: Edebiyat di roja îroyîn de zimanê derd, kul û jaña Kurdan e. Ew li diji dagirkirêne cekek

e. Li welatê me her roj nivîskar ji têne kustin. Tu mafe Kurdish tune ye. Ji ber vê yekê ji, edebiyat û siyaset ketine nav hevdur. Nivîskar divê rastiyê bibêje û binivise. Ew azad be. Li gor rewsa welatana, babeten nivîsandinê ji têne guher-tin. Mesela nivîskareki Alman dikare pirtûka xwe li ser meymûnekê binivise. İntresa (eleqa) wî jê re heye. Nivîskarê Kurdish ji, di dema sistema Sosyalist de hatibû bi sinorkirin. Ew mecbûr bûn ku, pesn û propagandaya sosyalizmê bikiran. Niha ev sinor û dîwar ji pêş nivîskarê Kurd ji rabûye. Ew bê sinor û azad in. Her nivîskar li gor intresa xwe mijaran hildibijere.

Di edebiyata Kurdî de rexne tune. Rexnegir tune. Xwendevan tune. Bazara firotinê tune. Dema rexnegir û bazar tune bin, pirtûk û berhemên Kurdî winda dibin. Iro ji me re tiştên pratik lazim in. Hin alfabeke me ya standart tune. Kurdish ku universtite temam kirine hin nikarin bi Kurdi bixwînin. Divê alfabe û rîziman bêne hêsankirin û di nav xelkê de belav bibin. Xwendevan bêne tes-wikkirin. Neteweyek bê ziman û bê edebiyat nikare bijî.

Mahfuz Mayî: Di bo ku Kurd bîkevin nav cîvaka neteweyen a-zad, divê Kurd bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Ziman, bingeha gel e. Ji ber vê yekê, dagirker zimanê me qedexe dikin û dixwazin gelê me ji binî ve, ji navê rakin. Heger ziman ji navê rabû, wê demê laşê kurmi û pûc li navê dimîne. Ziman û edebiyata me, gelek kevin û dewlemdend e. Di van salêne dawî de, li Kurdistanê, li herêma Iranê kevirek ji bin erde derxistin. Helbestekî bi Kurdi li ser wî kevir heye. Ev helbest 330 sal berî ışal hatîye nivîsin. Di dema ışlam û hatîye Môgolan de Kurdistan talan û wêranê canda Kurdi tê diyarkirin. Hin pirtûkxaneyen dewle-

mend ên ku li bajarêne Kurdistanê bûn şewitandin, hin ji wan ji dirandîn û hinek ji bi xwe re girtin û birin.

Divê em Kurd Ehmedê Xanî ji bir nekin. Xanî xwe naskirin e. Di dema Ehmedê Xanî de, gelek nivîskar û helbestvanê Kurd ên din ji hebûn dibe ku ji wî xwestir û bastir helbest dînivîsandin. Lé, taybetiya Xanî ji wan ev bû ku, doza Kurd û Kurdistanê anî zimên. Xwe nas kir, gelê Kurd da naskirin. Ehmedê Xanî ji bo vê yekê nemir e. Divê em Kurd her sal bi civîn û panelen mezin Ehmedê Xanî bi bir binin. Iro ji li derê welêt gelek nivîskar û helbestvanê me hene, dema ew dixwazin herine Iraqê dibêjin. "Ez Ereb im." Heger herine Tirkîyê dibêjin. "Ez Tirk im." Ev bêna-nameti ye. Li diji felsefa Ehmedê Xanî ye.


Firdâ Cewerî: Bingeha edebiyatê ziman e. Ziman nebe edebiyat ji nabe. Ji Cumhuriyetê he-ta niha. Tîrkan Kurdish qedexe kiriye. Kesî ji me ji di dibistanê Kurdish de nexwendiye. Berê bi Kurdi berhem hatine afîrandin. Lé bi tenê helbest bûn. Nesîr tune bûn. Ziman bi nesîr pêş dikeve. Di vi warî de, kovara Hawar hebû. Pîsti 1975' an siyaseteke sosyalist di nav Kurdish de dest pêkir. Ew ji bi marksizm û leninîzmê bû. Kurdish û berhemên Kurdî ne girîng bûn. Ji ber vê yekê ji, kes bi zimên û edebiyatê danediket. Wê tişteke bicük û ne muhim dît. Pîsti 1980' iji Bakur hinek kes derketin Ewrûpaya. Wan rola ziman û edebiyatê dîtin. Bi taybetî li Swêdê ev kar ges bû.

Em niha di destpêkê de ne. Edebîyat, divê ji bin tesîra siyasete derkeve. Bi serê xwe be. Divê nivîskar li gor programa partiyê ne-nivîse. Iro ji, di serê hinek kesan de ev heye ku. Lenîn gotiye. "Bimire nivîskare bê parti." Ev ne nehatin.

Niha li Bakur cîvakeke nû çebûye. Serê çekdarî cîvaka Kurdish ji binî ve guhert. Edebîyat dikare alikariya ve guhertîne bike. Belê talûkeke mezin li ser zimanê Kur-



Mehmet Uzun



Firdâ Cewerî

rast e. Divê azadiya nivîskar he-be.

Serefhan Cizîri: Baş e, em kîmasiyen xwe dixin stûyê Marks û Lenîn. Ma kêt dikaribû bi qasî Marks bixwenda? Ji Platon bigire heta Shakespeare. Marks hemû dixwendin. Lenîn ji her wiha...

Mehmed Uzun: Tîşten ku neteweyê dikin netewe, ziman e. Zimaneki yekgirti ye. Edeb û tore ye. Yekîtiya ruhiyetê ye. Ruhiye-teke neteweyî. Tîkiliyên dîrokîne. Hisyarbûna neteweyî bi riya edebiyat, huner û muzikê gurr û ges dibe. Mesela li Ewrûpa di dema pêsketina kapitalizmê de, e-debiyat ji bi pêş ket. Li Ewrûpa kesen wek Shakespeare, Servantes, Gote û yên din derketin. Li Rojhelat ji wek Firdewsi û Ehmedê Xanî... Wan kesen wiha bi dîtin û bir û baweriyen xwe ci-vakê guhertin. Servantes şexsiye-ta neteweyî da Spanyolan. Bi van bîr û bawerîyan mîritiyen xwe yên bicük kirin yek û dewlestenen neteweyî yên yekgirti çekirin. Lé, Kurd ji vê yekê mehrûm man. Mîritiyen xwe nikaribûn bikine yek û dewlesteke yekgirti çekirin. Yani dîtinê Ehmedê Xanî bi cih nehatin.

Niha li Bakur cîvakeke nû çebûye. Serê çekdarî cîvaka Kurdish ji binî ve guhert. Edebîyat dikare alikariya ve guhertîne bike. Belê talûkeke mezin li ser zimanê Kur-

dî heye. Asimileyeke zêde û bê sinor heye. Li Tirkîyê, bi cerxa dewletê re, bi tenê 12 kanalên televîzyonê hene ku her saet li diji Kurdish şer dikin û Kurdish didin ji-birkirin. Ev tesîra asimilasyonê li şivanê serê çiyayê Cudiyê ji dibe. Ji ber vê yekê, iro xebata zimên û edebiyata Kurdish muhîm e. Divê dem û dezgehên Kurdish bîn avakîrin. Divê xebatên li der, bigîhîn welêt. Heger ev xebat negîhène welêt, dê di kutupxaneyan de bîmîn. Derketina rojnameya Welat gaveke gelek mezin û girîng e. Rojnameya Welat gelek tîş hel kirine. Rêberen siyasi divê ji bo Kurdish kampanyayeke gelek xurt û berfireh vekin. Divê hejmara kesen nivîskar zêde bibin. Xwendevan zêde bibin. Lé, divê mirov tişteki ji, ji bir neke ku zimanê siyasi û edebî ne yek in. Herdu ji ne li diji hevdur ne. Hevdur temam dîkin. Di zimanê siyasi de ajitas-yon zêde û giran e. Di yê edebî de ne wiha ye."

Pist re ji guhdaran gelek kes rabûn, dîtin û rexneyen xwe anîn zimên. Pirranî li ser edebiyata macîrtiyê rawestan. Li naverok û mijarêne romanê Mehmed Uzun û cîrokên Firdâ Cewerî rexne kirin ku mijarêne wan ne rojane ne. Ji cîvaka Kurdish û bûyerên ku li Kurdistanê dibin gelek dûr in. Bi bersivdâna nivîskaran panel hat girtin.

Nûdem Xelata Edebiyatê dide



Kovara Nûdem, hejmara 5

Kovara huneri, candi û edebî Nûdem, bi hejmara xwe ya pêncemîn derket. Ew hejmara bi naver-

ka xwe ve balê dikisine ser xwe. Di Nûdemê de tê diyarkirin ku, dî "Xelata Nûdem a Edebiyatê" bê dayîn. Armanc ji bo tesvîkkirina nivîskariya Kurdi, sinemaya Kurdi, muzik, wêne, helbest, werger, hevpeyîn û hwd. tê. Anglo Nûdem bi hejmareke renge renge, ji aliye mijaran ve, xwe derdixe pês.

Bira Qederê besek ji romana Mehmed Uzun ku hê nû ye û li ser Malbata Bedirxaniyan hatîye nivîsin. Hüseyîn Düzen bi Nizamettîn Aric re li ser sinemaya Kurdi û filmê "Klamek" ji bo Beko hevpeyîn dirêj, nivîsa Mervanê Ehmedê Batêyi dide nasîn.

Dayîna xelata edebiyatê ji aliye kovara Nûdemê ve xizmeteki gelek bas e, ji bo tesvîkkirina nivîskariya Kurdi, gîhandîna nivîskarîn nû û dewlemdîkirina berhemîn nivîski yên bi Kurdi.

Weşanxaneya Melsa bi çalakiyên nû dixwaze xizmeta xwendevanê xwe bike

Xwendevan û kesen eleqedar dikarin hemû pirtûkên bi Kurdish, pirtûkên zanistî û yên ku li ser Kurdish hatîye nivîsin, qaseten bi Kurdish û her celeb kovar, qert û afişan ji Weşanxaneya Melsayê bi dest bixînîn.

Navnîşana Xwestinê:
Nuruosmaniye Cad.
Atay Apt. No: 5, Kat 3/8
Tlf: 512 29 17

Welatparêzê mezin Nûrî Dêrsimî, ku ji deh sal berî mirina xwe, gora xwe li Kurdistanê da çêkirin, digot:

'Ezê li Kurdistanê bi rehetî razêm'

Bêrîvana Dêrsimî

Bûyerek kevn e. divê zanibin Ji cîrokan maye Dêrsim Di nav welatê min de vesartî Klameke li ser derdan e. Dêrsim Sal, si û hest bû li çiyan.

Sewitandin, hilwesandin, kevir li ser keviran nehiştin, a- xa Dêrsimê bi xwînê av dan û yên zindîmayî jî, sirgûn kirin.

Xwendevanên hêja, hûn bas dizanin, ji wan sirgûnan yek jî welatparêzê navdar. Nûrî Dêrsimî bû.

Welatparêzê mezin, ronak- bîrê nemir Dr. M. Nûrî Dêrsimî di sala 1892'an de, li bajarê Dêrsimê, gundê Axzonikê hatîye dinê. Ronakbirê nemir, ji E-

mîna gost û hestî. Li aliye kîtiya xortan û li aliye din jî, yekîtiya eşîran pêk tîne. Rojê bi hezaran mirov ji ser an di bircîtiyê de, an jî, ji nexweşîya hêl û ta (tîfo) dimirin. Di vê demê de. Kurdistan xwîn digiriya. Jin, keç û kalên Kurd li diji Almanan bi girî "Gorî" digotin. Baytar Nûrî, gorîna kaleki wisa dinivîse.

Alamanî, Alamanî Te çîma me ra qenûnek dananî Ar di mala te keve Alamanî Te pasiya mîrân me re anî Mala te bişewite Alamanî Te kokê mîrân me re anî.

Di dawiya sala 1916'an de, sirgûnî Sêwase (Kangal) dibe. Di demekê kurt de, xwe bi e- şîrên Kurdan dide nasîn. Bi ke-

ça Hecî Axa (selvi) re dizewice. Li wir jî di demekê kurt de sirgûnî Giresûnê dibe. Di 1918'an de dice Sten- bolê û li Xwendegeha Baytariyê diploma distîne û v e d i g e r e Sêwasê. Di vê demê de ye ku, tevî serhildana Koçgirî dibe û di wê serhildanê de roleke mezin dilize. Xwe

zîdetir bi eşîran dide hezkirin û eşîran radike ser lingan. Dewleta Tirk bi lez û bez, qerarê bi- darxistina wî dide, lê cesaret nake wî qerarî bi cih bine. Ji ber ku Herêma (eyaleta) Dêrsimê hakimiyeta dewleta Tirk nas nedikir. Qet, tu caran împaratoriya Osmani û ta 1938'an, Tirkîye ya Mistefa Kemal Dêrsim nexistine bin desten xwe. Dêrsimê, heta sala 1938'an serxwebûna xwe parastiye.

Di sala 1920'an de Nûrî Dêrsimî, li ser daxwaziya Seyid Riza, vedigere Dêrsimê. Hîngâ sêst esir li Dêrsimê hebûn. Di nav wan eşîran de, yekîtiyê pirr zeyif bû. Li aliye din jî, dewleta Tirk erîsê mezin dest pê kîrûn.

Daxwaza Seyid Riza bû ku, hevalek bice welatên biyanî û alikariyê bixwaze. Vi karî Elişer digire ser xwe. Roja ku Elişer wî karî digire ser xwe, ji aliye Rehber ve, ev welatparêzê nemir, sehid dikeve. Dema Elişer sehid dikeve, wî karî Nûrî



Li aliye rastê Dr. M. Nûrî Dêrsimî û hevalen wî Kimil Aziz û Mahmed Ali

Dêrsimî digire ser xwe. Di llona 1937'an de, welat terk dike û li Sûriyê bi cih dibe. Di vê demê de, hevalen Partiya "Xoybûn" nas dike û dibe endamê partiya Xoybûnê. Ji bo tevgera Dêrsimê ji gelek welatan alikariyê dixwaze, lê mi- xabin daxwaza wî bê bersiv dîmîne. Li aliye hakimiyeta Fransizan mafe starbûnê nedîdan û li aliye jî dewleta Tirk. Ji bo kustina wî dolaviyê (qomployê) mezin cêdikirin. 24.12.1938'an de derbasî Ammanê dibe. Li wir ji dewleta Tirk dest bi dolaviyan dike. Di 29.10.1940'an de ji Ammanê dice Helebê û li wir bi cih dibe. Li Helebê Kurdên Dêrsimê nas

dike û bi keca Ali Axa re (Feride) ji esira Semikan dizewice. Dema ku ji welat derdikeye eleqa wî di gel Selviyê (jina wî) tê birrîn. Kurê wî Elî jî tevî se- hidîn Koçgiriyê dibe. Di sala 1950'yan de dest bi nîvîsîn bi navê: Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim (Kurdistan Tarihinde Dêrsim) û Serpêhatiyê Min (Hatiratim) dike.

Welatparêzê nemir, ronak- bîrê mezin, di sala 1973'an de li bajarê Helebê dice ser dilova- niya xwe û li bajarê E<None>f- rînê tê vesartin.

Bi gotina jina wî: "Wi gora (mezelê) xwe deh salan berî mi- rîna xwe cêkiribû." "Cima cedi- ki?" min pîrsi. Wî got: "Eger ez

bimirim, hûnê bi lez û bez min li nav Ereban vesérin. Lî ez dixwazim li nav Kurdan gora xwe cêbikim. Ji ber vê yekê ye jî, eger ez ji niha ve cihê xwe bizanim, nas bikim, ezê bi re- heti bimirim." Jina wî dîsa wi- ha dibêje: "Herwekî ku hûnê jî bibînin, wî ew cêkir, li dora wê dîwar kisand' û dar lê cand û pasê wiha got: "Niha ez cihê xwe dizanim. Kurd tén û dicin û ezê bi reheti razêm."

Çavkani:

1. Di dîroka Kurdistanê de Dêrsim (Kurdistan Tarihinde Dêrsim)
2. Serpêhatiyê Min (Hatiratim)
3. Bi Feride Dêrsimî re hevpeyvin: Berxwedan, hejmar: 155
4. Jin û Welat: Kemal Burkay

Di warê lîteraturê de pênuzeke tûj ÎBSEN

Gavan Koçer

İbsen di edebiyata dinê ya nû de. xwedi cihekî girîng e. Di warê dramayê de tesireke mezin afi-randiye. Dramatikerên ku ji pas wi hatine. zêde di bin tesîra wî de mane. Li sanoyan, qabiliyeta İbsen sembolek e. Ev qabiliyet e ku hê jî pêl bi pêl temasevanan dikişine eywanen şanoyan. Lé. ev qabiliyeta han. ji her cend se-deman hê bi dorfirehi ji aliye gelê Kurd ve nehatiye nasandin. Gelo kî ye. İbsen?

Henrik İbsen, di sala 1828'an de li bajarekî bicûk ê Norwecê. Skien, di malbateke dewlemend de tê dinê. Bavê wî bazirgan e. Lé hîn di ses saliya wî de kar û barêna malbatê ber bi siûdeke res ve dicin. Rindî û baweriyan bo-riyê hêdi hêdi cihêن xwe ji pêxwasi û bêbaweriyan re, diteri-kinin. Ev bêbaweriya sosyal ku di malbatê de dîqewime, tesireke mezin li ser jiyana İbsen dihêle û wî mijûliya pirsgirêkên hundirîn dike. İbsen, ev dubendî û bêba-weriye, ku wî hê wek zarokek bû seh dikir, di berhemâ xwe ya ye-kemîn. **Catelina** (1850) yê de tîne ziman. Di Catelinayê de İbsen, ji aliye wêjeyê ve, bi pirra-nî di bin tesîra Shakespeare û Schiler de maye. Listik bi duben-diyan giyanî ve tije ye.

Sedsala 18'an, dema romantika neteweyî ye. İbsen ji para xwe ji vê distîne. Berhemên wî yêne vê demê, bi pirranî girêdayî dîroka Norwecê ne. Mijara berhemâ wî ya sanoyê. Mijara Qiralê (Kong-semnerne: 1863), li ser bawerî û bêbaweriya amanca jiyane bilind dike. Di lehengiya qiral û hem-berê wî de, hêzên ku Norwecê tî-nin ser hev û yêne ku ji hev belav-dikin, bi awayeke dramatikî têni-sirovekirin. Li vir İbsen, bala xwe dîksîne ser ajotina romantik ze-manê boriyê. Ev berhemâ wî ya yekemîn e ku di literatura dinê de İbsenê dike xwedi pareyekê.

Hoyen jiyane, dubendiyêne ku di nav Norwecê û Danîmarqayê de ne. İbsenê davêje nav şewate-ke din. Di 1866'ê de, li Romayê bi navê "Sewat" ê listikeke dra-matikî têni-sandin. Zimaneki polemik tê bikaranîn û bi giranî li ser exlaqa kesaneti û idealizmê ku tu bi qeydeki ji seri danade, tê sekinandin. Hercend niviskar ras-te rast, giranî nadê olê ji, di sexsi-yetiya seristikvan de, teolojiya kevnare ku bi romantika bakur ve girêdayî ye, bi awayeke vekirî der-dikeve hólê û listik rengeke oli di-gire. Qehremana Sewatê Agnes, jineke malan e û nermiyê sembo-lize dike. Her tistî ji bo giyan û Xwedê evînê, deus caritais, dikâ-re qurban bike. Dilê wê birîndar-e. Kul û kederên wê bêqiyas in.



Ev wêne ji aliye, hunermendekî Norwecî, Edvard Munch ve hatîye çêkirin.

"Sewat" bi dijberiyan tije ye. Hêvi pîr in. Lé tu yek hêvi ji, bi cih nayê. Qehremane Sewatê di muameleyê de li dû ideyen xwe ye. wan mehkûm dike û di da-wiyê de xewn û fenteziyên xwe winda dike. Dibe bê ide (raman).

İbsen him helbestvan, him ex-laqvan û hem ji li du iidealân rindiye ye. Lé dramayen wî pîr caran di dijberiye hev de têni nivis-andin. **Peer Gynt** (1867) ber-hemeke ku ji her aliye ve bereva-jiya "Sewat" ye. Ramana bingehîn di herdu berheman de ji yek e, lê karekter bi tevayî cuda ye. Seristikvan Peer, helbestvanek e û di rezén "Seytan di hemû tistên. ên ku bîrmayı ne de, der-ke. Seytan di hemû jinan de der-ke..." de derew, déxel, xewn û egoizmê sembolize dike.

İbsen, di **Keyser û Galile-yani** (1873)yê de dixwaze di nav dubendiyen de yekîtiyê çêke. Di vê berhemê de jiyana seristikvan Julian, a hundirîn û psîkolojiya wî tê nirxandin. Dîroka der û dora wî bi siûd û toreyen zeman ve têni xemilandin. Li vê derê İbsen dixwaze bi forma realizmê de na-va azadî û pêwistîyên dîrokî de, têkiliyan biafrîne û wan bi kesan re girê bide. Hedef û maneya dîrokî wiha tîne ziman: Kijan nirx dî di jiyane de bêni bikaranîn?

Mala Pitikê (1879) "Et Dukkehjem" pirranî wek têko-sîna jinan tê fêmkirin. Ji bo vê "trajediya vî zemanî" dibêje İbsen. Seristikvan. Nora, jineke jîndar û sîrin e. Rojekê radibe, bi haydarî li ser rûmeta mirovahiyê difikire. Bi hêviya ditina rastiyê, ji mala xwe direve. Ji xwe dipirse: "Gelo kî xwedi rastiyê ye, ez an civak". Nora, civakê di bin tore û zagonen (qanûnên) mîran de di-bîne. Dixwaze sexsiyeta xwe rizgar bike.

Sawêran, (Gengangere) (1881) dramaya malbatekî ye. Dema derdikeve, skandalen mezin diafîrîne. Li vir İbsen vesartî û

durûtiyên ku di civakê de qewi-min, tîne ziman û nîşan dike ka raman û toreyen kevnare cawa bi awayekî vekirî hê ji dijîn û civakê dihelinin?

Di Dijminekî Gel (1882) de İbsen, meşvan û şoresser e. Li dijî dijminen azadiyê û rastiyê, li dijî hêzên bêmafi derdikeve.

Listika sanoyê. **Ordeka Kü-vî (Vildanden)**: 1884. İstekeke tevíhev e. Bi elementen berevajî, bi komik û trajediyan tije ye. Ev elementen berevajî, bi alikariya sembolên mezin bi hev re dijîn. Qehremana listikê, kecika cardeh sali (14) Hedvig, di atmosferike derewin û idealizmeke ziwa de di-be qurbana psîkolojiyeke dinamik (calakî), ku kesek vê atmosferê dernaxîne. Malbat, li gor xwe dilges e. Lé, rojek hevaleke malbatê yê kevin tê serdaniyê û rastiyen jiyane malbatê ji wan re rez dike. Ev di malbatê de dibe sedema zelzeleyan. Li ser vê İbsen wiha dibêje: "Heger hûn mafê derewê, ji yê ku jiyana xwe li ser vê daniye, bigirin, wê çaxê hûn bi vê re dilgesya wî ji, jê digrin."

İbsen, di listikên xwe de, têkili-yek di nav hunermend û modelê, huner û sahiya mirovan de, datîne. Di jiyana mirovan de duben-diyan rojane yê sosyal, exlaqî û psîkolojikî di formeke trajik de tîne ziman. Soreşa jiyani, di exlaq û olê de, guhertin û ji bo van guhertinan têkoşin, rengeke nû di-de berhemen wî. Ramanen wî i-dealist in. Sîla wî realizm e. Heger mirovan de, şanoya realizmî ji aliye naverok û formê ve bi İbsenê ve dest pê kiriye, ne zede ye.

Ev pênuza tûj, dema di sala 1906'an de li bajare Krîstiania yê dimire, li pas xwe gelekî berhemen hêja dihêle.

Çavkanî:

- Berhemen İbsen: Et Dukkehjem, Gengangere, Vildanden
- Dîroka literatura dînyaye
- Dîroka literatura Norwecê
- Gotinên İbsen

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Heq navê Xwedê ye

Kî heq nas neke, Xwedê ji nas nake... Dînê îslamî ji heq e; kesê ku bi rastî misilman be, divê ku heqê tu kesî înakar neke, terefdarê heqê hemû kesan be. Li gor vê rastiyê, ew kesen ku, dawa misilmantiyê dikin û li dijî heq û mafê Kurdan ên insanî, çandî, demokratik û rêzanî derdikevin, hem ne misilman in, hem ji ne Xwedênas in.

Ew mirovên ku, hemû mafê mirovî ji xwe re dixwazin, divê ku wan mafan ji Kurdan re ji, bixwazin. Hem divê ku Kurd ji ji hemû mafê, hemû insanan re rîayet bikin û bivê. Misilmantî û insanetî, bi virr û derewan çenabe. Madem ku, Kurd ji insan in, divê ku heqen wan ên insanî ji, her weki hemû insanan hebin û bêtin dayin û naskirin. Înakarî û tecawizi heqen wan ji, barbarî û hovitî ye, kafirî û înakarî ye...

Heq û mafê insanan ci ne?

Hebûn û jiyan, kultur û ziman, dewlet û hikûmet, mal û serwet, weten û welat, din û jîn, serxwebûn a-zadî û demokrasî... Gelê Kurd hemû van mafan, ji hemû kesan re nas dike û divê. Gelên din ji, divê ku ji Kurdan re wan hemû heqan nas bike û bivê. Ewên ku, nas nekin û nevîn ne insan û mirov in, belki heywan û hov in.

İsal, nêzîkî du mehan ez li Ewrûpa geriyam, bi gelek, mirovan re, ko-mel û zanyar û rêzanan re, min hevalî û tevgerî kir. Bi rastî, ji bil kesen navmisilman û sextekar, hemûyan ji mafê Kurdan nas dikirin, diva û dixwestin. Lé mixabin navmisilmanen dilgawir, wekî gurên har û hovên barbar, li dijî Kurdan û mafê Kurdan bûn û navê Kurdan nedigotin. Bi wî his û baweriya xwe ya xwar û çewt, dawa misilmantiyê ji dikirin.

Wilo bê mentiq û bê idraq, tewş û şewş bûn ku, ji bil hinek virr, derew, demagoji, propaganda û xapandîn genî, tu tişt ne dizanîn, ne ji fêm dikirin ku, min ew serserî dîtin û bi her awayî min heq da gelên Ewrûpa yê ku dibêjin. "Bila ew hov û barbar ji welatê me derên."

Bi rastî ji ku, ez di şuna hikûmeten Ewrûpa de bûma, minê ew hov hemû biqewiranda, welatê xwe ji wan paqîj bikira. Di baweriya min de ku, Hz. Muhammed ji wan gemar û bêhiş û geniyan bidîta, wê wi ji tú kira (tif bikira) rûyê wan û heq bida Ewrûpiyan. Lewre, ew hem lekeya rûyê insanetiyê ne, hem ji ya İslamiyetiye ne. Lewre İslamiyet, dînê heq, hiqûq, zanîn, mentiq, insaniyet, edalet û seadetê ye. Hemû mafê insanî, ji hemû kes û gelan re wek hev nas kiriye û da-yê. Hovitî, barbarî, heqnenasî û zilm û zor red kiriye û gotiye: "Wan tiştên hûn ji xwe re dixwazin û divên, heta ku ji hemû insanan re ji nexwazin û nevîn imana we çenabe û hûn nabin misilman."

Li ser wergerê guftûgo

Destpêk rûpel 16

Lê em Kurd, vê xebatê cidi nagirin. Divê em bîryara xwe bidin. em dê gotina ji kijan zimanî bigirin. Em dê ji zimanê Ewrûpiyan bigirin an ji, ji ew zimanên gelên ku iro cîranêne me ne wek yên Farsi. Erebî an ji, ji yê Tirkî em bigirin? Yan ji em dê bi xwe cêbikin. Mirov bi xwe dikare hinek gotina cêbikin. Hinek hene ku ne pêwist e. mirov ji wan re gotinêne Kurdi cêbikin. Wek radyo, televizyon, telefon... Ev gotinêne wiha bûne zimanê cihanê. Em ji divê bi hêsanî wan bi kar bînin. Divê termînolojiyeke me hebe. Ya na em mecbûr dimînin, em radibin pirtük û berhemîn xwe bi zimanekî biyanî di-nivisin.

M. Mayî: Em Kurd, karê wergerê girîng nabînin. Ji 20 sali bêhtirîn ku ronakbîr û nîşkarêne Kurdi li Ewrûpayê ne. Mirov nikare bibêje qet tîst nekirine. Lê, ew tiştîn kirine, gelek kêm in û bê qelite ne. Li vir problemen ekonomik, weşanxane û belavkirinê ji hene û ev roleke mezin dilizin. Ev rî li ber Kurdêne ku dikarin an ji, dixwazin karê wergerê bikin digerin. Ka me li Swêdî ci kiriye? Me hîn Mem û Zîna Ehmedê Xanî ne-kiriye bi Swêdî. Ev Mem û Zîna ku taca serê mîe Kurdan e...

S. Cizîrî: Ez ji di wê baweriyê de me. Lê divê mirov gavêne pratik biavêje. Bi ditina min ew tiştîn ku pêsi mirov dikare bike ev in. Ev wesanaxneyen me yên ku hene, ew kovarîn me yên ku hene bikaribin di hinek meseleyen ziman de, bi hev bikin. Heger mirov li wesanaxneyen Swêdîyan binêre pirraniya wesanaxneyen wan, pisporê wan ên ziman hene. Ew kes wergeran carek din di cav de derbas dikan. Gotin û ifadeyên wan diguhêrin, rast dikan û pasê cap dikan. Lê yên me Kurdan, gelek wesanaxane cêkirine.

Mirov hemûyan bîne ser hevdü ji, yeka bas jê dernakeve. Zimanê wan ji ne wek hev e. Ev ji anarsiyê bi xwe re tîne. Tiştekî pîr xerab e. Mirov divê hemû imkanen xwe yên madî û teknîkî bike ser hevdü. Tîtekî baş çedîbe. Mesela li Basûr navê Aledîn Secadi hatîye bîhistin. Pirtükîn wî li ser dîroka edebiyata Kurdi hatîne nîvîsandin. Lê ji ber ku bi tîpen Erebî ne, em Kurdêne Bakur nikarin jê feyde bîbinin. Heger hinek weşanxane bîkaribin wan wergerinîn ser tîpen Latînî, dê ji bo me Kurdêne Bakur gelek bi feyde bûbûna, heta niha imkanen me yên madî tev di xîzmeta siyasi de bûne. Divê ji vir şûn ve, em imkanen xwe yên madî bixin riya kultûr û edebîji.

A. Tigrîs: Wek ku we anî zîmîn, ji bo wergerere baş divê dem û dezgehêne me Kurdan hebin, kesen şareza hebin, imkanen madî û teknîkî hebin... Di vî warî de, çend dezgehêne Kurdan hene? Wek Enstitûyen Paris. Stenbol û Bexdayê. Ma ew cîma van karan nagirin ser milê xwe?

S. Cizîrî: Divê ji bo wergerê ji perwerdeyek hebe. Dezgeh hebin û dezgehêne neteweyî bin. Ev Enstitûyen ku te behsa wan kir, ez karekî wan ên bi rîk û pêk nabînim. Ev cend salen ku Enstituya Fransî li vî li wî bajari xwedigiravî karê ziman û kultûr dike, lê tîtekî li navê tune. Kovar derdi-xin. Tê de çend gotin heye ew ji nagihêje tu kesî. Enstituya Parisê bi dil û can, li ser vî tîstî nasekine. Enstituya Parisê wek gevzeka hinek kesan e. Ji xwe re tê de diplomasiye dikan. Ji xwe re tê de pisporîtiye dikan. Tê de ziman-natiye dikan.... A li Stenbolê ji, em bas jê ne agahdar in. Lê qasî ku em dibinin ew ji wezifeyen xwe bi cih nayînin. Pirr gazinan dikan. Dibêjin hevalen ku li Ewrûpa ne ji me re alîkariye nakin. Lê rojekî ji.




Mahfuz Mayî, bi zimanêne Kurdi, Erebî, Farisi, Swêdî û hinek ji bi İngilizî dizane. Li Bexdayê muhabîbe xwendîye. Helbestvan e.

alikariye ji keseki ji nexwestine. Li mala xwe rûdinin û gazinan ji xelkê dikan. Mirovîn ku di derekê de be û berpirsiyar be, ew bi xwe divê kar beş bike. Programan cêbikin. Ne ku ji xelkê bixwaze. Ev dezgeh wezifeyen xwe bi cih nayînin. Ez hêvî dikim, ji iro pê ve ew bikevin merhaleyeke din.

M. Mayî: Enstitûyen li Paris, Almanya. Stenbol û li Bexdayê bi rastî tîst nekirine. İmkanen wan hene. Lê, mesele li vir fedekarî ye. Cidiyet e. Li Bexdayê Korê Zanyarî Kurd hebû. Yanî bi navekî din Enstituya Kurdi hebû. Pişî beyana 11'ê Adarê hate çekirin. İmkanen wi gelek mezin û berfi-reh bû. Salê kovareke wê derdi-ket. Her yek 500 rûpel e. Hemû nîvîsar û gotarên wê li ser, ziman, edebiyat û kultura Kurdi ne. Karê wê yên wergerê pîr qels e. Hinek romanen Erebî wergerandin, lê gelek kêm e. Ev ji nayê wê maneyê ku, ewnakîn edî kesen me nîn e. Kes nikare. Ew kesen ku dibêjin ez vî karê wergerê dikim, cih hene. Wek weşanen Rewşen. Ew dikarin ji mirov re alîkariye bîkin.

Li Swêdê her sal yek di warê li-



Serefhan Cizîrî, bi zimanêne Kurdi, Tirkî, Swêdî û İngilizî dizane. Li Swêdê li ser dîroka fikri mastir kîriye. Nîşkar e.

teratûrê de xelata Nobelê distîne. Her kes di eyne salê de, ew wêrdi-gerin ser zimanê xwe. Lê em Kurd temâse dikan.

S. Cizîrî: Her kes kevir li Kurdêne li Swêdê dixe. Xeberan di-de. Di vî warî de Kurdêne li Swêdê, di nava Kurdêne Ewrûpayê de geleki aktiv in. În din tîtekî nakin û bi ser de ji, henekîn xwe bi Kurdêne li Swêdê dikan. Rast e kêm e. Lê divê tu berhemên Nobel ji kê re wergerîn? Bi Kurdi intresa xwendinê tune ye. Kî dikire? Civaka me gelek siyasi bûye. Li her tîstî di berçavika siyasi de mîze dike. Ev ji, ji rewsa Kurdistânî tê. Civaka me siyasetê wek parçeyek ji jiyanî nedîtiye. Siyasetê wek parçeyek ji ziman, edebiyat, kultur û ziman nedîtiye... Siyaset bi serê xwe wek tîtekî dîtiye. Mesela mirov dikare ji Kurdeki re bibêje, "Wele ez dê xelata Nobelê wergerîn Kurdi." Ew dê bêje, "Ji feyda wê ji siyasetê re heye?" Di Kurdi de, bazara (sûka) firotinê ji tune ye. "Berî ku mirov fêri bazzanê bibe, divê mirov pêsi bimeze."

A. Tigrîs: Ez dixwazim pîrsa xwe ya dawî bikim. Di pratîkê de,

gelo di kijan cur û warê edebî de, zêde zehmetî hene?

S. Cizîrî: Di her wari de zehmetiyen Kurdi hene. Hinek ali bêhtir bala mirov dikisînin. Ji ber ku edebiyat, çîrok, roman li ser zimanê rojê ava dibe, ji ber wê yekê ji, di vî warî de zehmetî zêde nîn e. Di warê edebî de, zimanê Kurdi hindik be ji, hinek tist pê hatine nîvîsandin. Zedetir di warê zanya-riyê de, zehmetî hene. Mesela hevaleki bixwaze problemeke sosyo-lojik an ji ekonomik bigire dest an ji, ji zimanekî din wergerine Kurdi, wê demê zehmetî gelek in. Wê demê ez dixwazim termînolojiya Marksîst bi kar bînim. Ez di vir de zehmetiyen mezin dikisînim. Heta niha di vî warî de termînolojiya Kurdi tune. Yan divê ez bixwe cêbikim. Mesela dibêjin hêzên berhem (ürêtim gücleri), bi zimanê biyanî ji termînolojiya wê heye. Dema ez bibêjim hêzên berhem, ez bawer nakim ku kes fêm bike û bixwîne. Wek ku tu ji pê dizanî carman ez hinek nîvîsaren wiha di Welat de ji dinivîsim. Lê zehmetî pîr e. Mirov naxwaze bi zimanê Kurdi ji bileyize. Bi ditina min ev ne rast e ji. Em dibînin her kes ji xwe re alfabe, gramer û gotinan çedike. Ev ne rast e. Divê mirov xwe berpirsiyar hîs bike. Ji ber vê yekê ji, em gelek carî fikir, hîs û ditinê xwe dixurmîcîn û bi Kurdi dinivîsin. Ji bo ku zimanê Kurdi xerab nebe. Hevalen pispor an ji dezgehêne Kurdan divê ferhengan cêbikin.


M. Mayî: Lê mirov dikare van peyvan di nava kevanê de bînivise hetâ ku li nav xelkê belav bibin û cihê xwe bigirin. An ji cewtiyên wan derkeve holê û paşê ji zimanê nîvîsê bîn derxistin. Divê di her warî de ferhengen cuda cuda werin amadekirin. Wek hemû gelî, ji me re ji ne yek, divê di her babeti de ferhengen me hebin.

XAÇEPIRS

Ceperast: 1-Muzîsyenê Kurd, di sala 1955'an de li bajara Sîne (Senedec) hatîye dinê. Ji Kurdistana İranê ye. Ni-ha li Swêdê dengbêjîye dike û bi Soranî distire. Di wêne de tê ditin 2-Heke, wer / Dijbera lêkera birinê / Di muzîkê de notayek 3-Dîrok, mîjû / Qencî, çeyî, baldarî 4-Baneşanek (ünlem) / Nesîl / Qedîya 5-Vîr, derew / Kîn / Di muzîkê dema sekne 6-Navê meha Newrozê 7-Ama, kesê ku nabîne / Adet, gerdiş 8-Bi Erebî zanyar / Pîvaneke giraniyê (Ji bo pîvandina debrê tê bikaranîn) 9-Navek jinan / Cephe 10-Rûcîk, sûret / İşaret

Serejêr: 1-Miletperwer, nasyonalist 2-Hay / Akîs 3-Qaf / Di edebiyatê de şîira ku bi çar benda tê nîvîsin 4-Înat / Rawirek zirav û dirêj ku bi jehr e 5-Mârangoz 6-Sembola Baryûmê / Tîşte ku difire, dikare bifire 7-Beşek ji milê mirov / Rewşen, rewneq 8-Navê qehremana berhema nemir ya Ehmedê Xanî / Kevnare 9-Tore, kevnêşop 10-Di İngilizî de peyva erê 11-Navê buhişa derewîn (Bi taybetî di edebiyata Erebî de) 12-Çerçî

Amadekar: Rasto Zîlanî



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYİ

Ceperast: 1-Seydayê Tîrêj 2-Oî / Alîkarî 3-Limêj / İran 4-Mijar / Azad 5-Mîr / Neon / Ar 6-Înat / Br 7-Rim / Ga 8-Ar / Lasar 9-Tûrik / Na 10-Sûk / Sîm

Serejêr: 1-Sol / Mîrat 2-Elîmîn / Rûs 3-Mîrâr / Rû 4-Drêj / Tilik 5-Jan / Mak 6-Ya / Reb 7-Êlî / Organi 8-Tîran / Aram 9-Îkaz 10-Rana 11-Êr / Da 12-Jîn

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneye rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li derive: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiyat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok.

Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
6 meh	120.000
12 meh	240.000
	60 DM
	120 DM

Em bi hev re hîn bibin

Zarokno emê vê heftiyê bi hev re dîroka Komara Otonom ya Mehabadê hîn bibin. Bi me avabûn û hilweshandina vê komarê neticeyên muhîm derxistine holê.

"Iro mixabin em nikarin der heqê dîroka Komara Mehabad ya Otonom ku di sala 1946 an de li Iranê damezirî, bi awayekî berfireh binivîsin. Ji ber ku Kurdêni ji bo avakirina komarê xebîfîne, dema komar ji allyê dewleta Iranê ve tê hilweshandin hemû belgeyên nivîski, bi awayekî ji holê radikin."

Her çigas kêm bin jî pirtükên ku li ser dîroka Komara Mehabadê hatine nivîsin vê dixin bîra mirov. Emê jî li gor van şertan, tiştên der barê komarê de têz zanîn bi kurtahî pêşkêsi we bikin.

Piştî Serê Cihanê yê Duyemîn (1939-1945) dewleta Iranê ji taqet dikeve û jî alî hêza xwe ve qels dibe. Otoriteya wê ya navendî ji hev dikeve. Artêsa (ordi) Sovyetê bi ser Iranê ve diçê û aya wê dagir (îstîla) dike. Piştî ku Kurdistan di sala 1924 an de bi **Peymena Loranê** tê parcekîrin, qismek Kurd jî li rojhilata Kurdistanê di bin idareya dewleta Iranê de dimînin. Di dawiya Serê Cihanê yê Duyemîn de gava ku Iran ji hêz dikeve, Kurperweriya Kurdêne wê herêmê xurt dibe û dixwazin di vê navê de rizgariya xwe bi dest xin. Ji bo vê ji dest bi xebatên siyasi, çandî û leşkerî dikan. Di van waran de rêxistinan pêk anîn. Di 16'ê Ilona 1942'an de Serbaz Mîr Hac û hevalen wî, bi navê "Komelê Ziyane-wey Kurdistan" rêxistinêk pêk anîn. Hecî yê ku Kurd bûya karibû bibe endamê vê komelê. Armanc bi awayekî veşarî birêxistinkirin û yekkirîna Kurdan bû. Bi sun de ji bo şiyarkirina neteweyî kovarek bi navê **Nîşîman** derxistin. Piştî ku xwe bi gel dan qebûlkirin, di Cotmeha 1945'an de **Partiya Demokrat a Kurdistanê** dameziran din.

DAMEZIRANDINA KOMARA MEHABADÊ

Ji ber rewşa Iranê ku ber bi nexwesiyê ve dicû, ji bo gelên bindestî wê jî fersendeyên (firsetên) rêxistinîyê bi pêş diketin. Partiya Demokrat dest bi xebatên leşkerî kir. Mistefa Berzanî tevde 800 pêşmergeyên xwe yên cekdar ji Kurdistanâ Basûr derbasî ya Rojhilat bû û

Komara Mehabad



Nexşeya Dewleta Mehabadê

beşdarî karêne leşkerî bû. Kurd û Azerî baş didîtin vê rewşê ji bo berjewendiyên (menfeet) xwe. Piştî xwe dan Sovyetê û Komara Azerbeycanê damezirandin.

Di 22'ê Cileya 1945'an de li Meydana Çarcıra **Qazî Mihemed** damezirandin. Komara Mehabad ilan kir. Ew roj Meydana Çarcıra û riyen wê bi ala Kurd û flamayên kesk û sor û zer hatibû xemilandin. Gava ku Qazî Mihemed li ser kursî dibêje, "Ji niha pê ve Komara Kurd ya Otonom damezirîye" gelê ku li meydânê civiyabûn bi coşkeke mezin li çepikâ didin û ji kîfa fişekan berdidin hewa. Paytexte vê komarê bajarê Mehabad bû. Jixwe navê xwe jî, ji wê distîne. Sînorên komarê ji Yekitiya Sovyetê dest pê dîkir, heta basûrê bajarê Bane û Serdeşte dom dîkir. Komar tevde se-râsere Kurdistanâ Iranê bû. Hin bajarê komarê ev in: **Mako, Selmas, Urmiye, Mehabad, Bûkan, Serdeş, Bane û Seqiz**.



Muhammed Huseyîn Seyfi Kadi, Qazî Mihemed, Abdulkasim Sadî Kadi

Qazî Mihemed bû serokkomar û hikûmeta xwe ava kir. Wezîrî û wezareta komarê ji van kesan pêk dihat.

1. Serokwezi, Hecî Baba Sêx.

2. Wezîrê Şer û Parastinê û Alikarê Serokwezîr, Mihemed Huseyîn Seyfi Qazî.

3. Wezîrê Perwerde û Hindekariyê, Menaf Kerîmî.

4. Wezîrê Karê Hundîrîn, Mihemed Emin Muînî.

5. Wezîrê Tendurustiyê, Seyid Mihemed Eyubyanî.

6. Wezîrê Aboriyê, Ahmed İlahî.

7. Wezîrê Kar û Bar, Xelîl Xusrev.

8. Wezîrê Karê Poste û Telefonê, Kerîm Ahmedîyan.

9. Wezîrê Bazırganiyê, Hacî Mistefa Dawidî.

10. Wezîrê Dadgehê (Edaletê) Mela Huseyîn Mecdî.

11. Wezîrê Çandînê, Mihemed Wefîzade.

12. Wezîrê Şêwirmendiyê, Hacî Abdurrahman İlhanîza-de.

13. Wezîrê Çandê, Menaf Kerîmî

14. Wezîrê Agahdariyê, Sîdiq Heyderî.

Komara Mehabadê di nav salekê de di warê siyasi, aborî, civakî, çandî û leşkerî de xebatên hêja kir. Di wê demê de ziman û edebiyata Kurdî bi pêş dikeve. Rojnameya **Nîşîman** û kovarên **Agir, Hawar, Hilale** û **Gelawêj** di warê çapeménye de xebatên giranbuha pêk tînin. Di wê demê de em rastî şanogerîya Kurdî ji dîbin. Leyistîka **Dayîka Nîşîman** li her bajarê Kurdistanê tê sahnekîrin. Radyoya Kurdi her roj di navbera saetên 16-22'an de wesanên xwe dike. Artêsa (ordi) Kurd di destpêkê de bi 70 serlesker û 1200 leşkeran ve tê damezirandin. Di artêsa de 4 serbazên ku dû re terfi generaliyê dikan hene. Navê wan ev in: Huseyîn Seyfi Qazî, Omer Xan Şîkal, Hame Reşîd Xan û Mistefa Berzanî.

HILWEŞANDINA KOMARA MEHABADÊ

Hê sala damezirandina komarê nebûbû, rewşa po-

litik li dînyayê guherî. Yekitiya Sovyetê leskeren xwe ji nav aya Iranê vekişand. Dewleta Iranê hate ser xwe û artêsa xwe berhev kir. Ü çendek bi sün ve cara pêsi êrisi ser Komara Azerbeycanê kir. Azeriyan bêyi ku ber xwe bidin bê şert teslim bûn. Bi sün de artêsa Iranê bi serokatiya **General Fazîullah Humaynî** de bi ser Kurdistanê ve cûn. Hin serokşîrên Kurd alikariya Iranîyan kirin. Hinekan jî dev ji piştigiriya Komara Mehabadê berdan. Qazî Mihemed jî fevi wezîrên xwe teslimî artêsa Iranê bû. Berzanî teslim nabe û hêzên xwe vedikisine ciyê. Hetabiharê bi Iranê re ser didomîne, dû re derbasî Kurdistanâ Basûr dibe.

Rêvebirêne Iranê di bin serokatiya General Fazîullah Humaynî de, di **30'yê Adara 1947**'an de li Meydana Çarcıra ku ilana Komara Mehabadê li wir hatibû kirin. Qazî Mihemed û hevalen wî bi dar ve dikan. Komara Mehabadê ku bi piştigiriya hêz û dewletên biyani lê ne bi hêz, yekiti û qeweta gelê xwe ve dameziribû salakê jiya û wiha jî xera bû cû.

Jêder:

1. 1946 Mehabad Kürt Cumhuriyeti, William Aegleton, Wesanên Koral

2. Dîroka Kurd û Kurdistan, Amed Tigrîs, Aso Germiyanî, Wesanên Koral

BERSIVA VAN PIRSAN BIDIN

1. Komara Mehabadê kengê ava bû?

2. Komara Mehabadê kî hilwesand?

3. Kurdistan bi kîjan peymanê û kengê tê parcekîrin?

4. Komelê Ziyane-wey Kurdistan kengê, bi serokatiya kî û bi ci armancê damezîn?

5. Navê kovara ku Komel derxist ci ye?

6. Kengê Partiya Demokrat a Kurdistan damezîr?

7. Serokê Komara Mehabadê kî bû?

8. Navê bajarê Mehabadê ci ne?

9. Navê rojname û kovarén Mehabadê ci bûn?

10. Sanoya ku di wê demê de hate sahnekîrin, navê wê ci bû?

11. Navê generalê Iranê ku Mehabad hilwesand ci bû?

12. Komara Mehabadê kengê hate hilwesandin?

13. Ci bi serokkomar û wezîrên Mehabadê hat?



Qazî Mihemed, roj 22 Cileya 1946 an li Meydana Çarcıra Komara Mehabadê ya Kurd ilan dike.

Mahfuz Mayî, Amed Tigrîs û Şerefxan Cizîrî li ser wergerê axivîn

A. Tigrîs: Ez dixwazim pirsa pêsi ji hevalê Mahfuz bikim, gelo tu ji kerema xwe re dikarî ji me re tarîfa wergerê biki?

M. Mayî: Werger wek tekst helbest an ji nivisarek ku ji zimanekî mirov, wê dike ser zimanekî din. Ev dikare bi devki be û dikare bi niviskî be ji. Ev kar wergerandin e.

A. Tigrîs: Wek ku tê zanî em Kurd cend alfabeyleñ Kurdi yê cur be cur bi kar tinin. Wek alfabeyleñ Kurdi ya Latinî, Erebî û Kirili. Hinek kes hinek berhem an ji nivisarek Kurdi ji van alfabeyleñ, ji yekê werdigerinin a din û jê re dibêjin werger. Helbû ku, herdu ji bi Kurdi ne, lê ew bi tenê ji alfabeyleñ werdigerinin alfabeyleñ din. Ev ji karê transkripsiyonê ye. Gelo ci ferq di nava werger û transkripsiyonê de heye an ji hene?

S. Cizîrî: Transkripsyon wek ku te ji got, mirov ji alfabeyleñ werdigerine alfabeveke din. Alfabeyleñ Kurdi yê Erebî, Kirili û Latinî hene. Dema mirov nivisarek ji alfabeyleñ bike alfabeyleñ din, ew kar dibe transkripsiyon. Ev nabe werger. Bi ditina min, werger hinek kurtir e. Bêhtir bi maneya zimanî ve girêdayî ye. Bi girêdana gotinan a bi hev ve ye. Avakirina hevakan e. He ta mirov dikare bibeje werger ne bi tenê rast rast ziman tenê ye. Bi xwe re hinek tistên din ji tine. Bi kulturê ve girêdayî ye. Di wergerê de mirov li ser maneya hevokê râdiweste. Difikire û di zimanî din de, cawa xwes û rast bê, wiha wergerine. Lê transkripsyon guhertina tipan e. An ji tistên hûr û mûr in. Mesela gelek biwej, gotinîn pêsiyan û gotin di her zimanekî de bi awayeki ne. Li gor zimanîn tê wergerandin. Yani ne guhertina tipan e. Ne kopi ye.

M. Mayî: Wek Serefxan ku got, ez bi xwe ji, ji vê karê transkripsiyonê re nabêjin werger e. Lê, em Kurdi ji vi karê transkripsiyonê re dibêjin werger. Ev ne rast e. Werger ji zimanekî din e. Lê li vir meseleyî, zaraveyan (diyalektan) ji heye ku, mirov wê ji bir neke. Mesela ez nivisarek ji Kurnanciya jorîn (Kurnanci) ji alfabeça Latinî wergerinim Kurnanciya jorîn (Sorani) an ji, ji Kurnanciya jorîn û alfabeça Erebî wergerinim Kurnanciya jorîn ser tipen Latinî, ez ji vi kari re dibêjin werger. Ji ber ku ne-


vokên Kurnanciya jorîn û jêrin ne wek hevdu ne. Heger ez raste rast bi tenê tipan wergerînim, wê demê tistik fêm nabe. Dibe ku şaverox wek xwe bimîne, lê hevokasî ji binî ve tê guhertin.

S. Cizîrî: Ji bo hevdu fêmkirinê divê em alfabeyleñ yekgirti bi kar binin. Yekitiya zimanî, yekitiya alfabeyleñ ye. Ez bawer nakim ku, wek hinek kes dibêjin zara veyen me dûri hevdu ne. Ez bi Swedi bas dizanim, zimanî Swediyan ji di gelek warî de dûr hev e. Mahfuz bas dizane ku, ji bistî bêhtir diyalektan Erebî hene. Lê, kes nabêje diyalektan Erebî vir û wir. Dibêjin zimanî Erebî.

A. Tigrîs: Gelo ferq di navbera wergerîni ji zimanîn yeke min an ji orjinal û yê duymen û sêyemîn de hene? Mesela mirov raste rast Puskin ji Rûsi wergerîne an Ingilîzi wergerine bas e?

S. Cizîrî: Cawa, ferqeke pîr mezîn cêdibe. Ferqa mezîn di vir de ye. Naverok qels dibe. Dilopek xwin jê dikeve. Heger em niha ji Erebî tistikî wergerînin Tirkî û bi dûr re ji, ji Tirkî wergerînin Kurdi, ez bawer im, di her wergerê de hinek mane, hinek his jê winda dibin. Ji ber vê yekê, heta ku i'mkanîn mirov hebin mirov ii zimanîn orjinal wergerine zimanî xwe pîr dê bas bibe. Wexta ku wilobe werger bi gosî dibe. Bi xwin dibe. Bi his dibe. Dema cend zimanî bê guhertin hisk û ziwa dibe. Zimanî desifrekîrîna kodan e. Her kes nikare ji kod û sıfran fêm bike. Wêk dergehê Cilheramîyan e. Zanvari veki bi serê xwe heye ku jê re dibêjin samantik. Yani maneya gotinan. Di her zimanî de kod û desifrekîrîna taybeti hene. Ev ji bo edebiyatê گeleki giring e. Lê, zimanî matematik, kimya û fizikê nêzi hevdu ne. An ji zêde winda nabe. Lê, zimanî edebiyatê nazik û giring e.

M. Mayî: Zanayekî wergerandinê dibêje ku, "Wergerandin karekî pêwest e û karekî ne mümkun e. Mebesi ev ku, mirov bika ride ew his û ditinîn-niviskarî orjinalê wergerine zimanekî din. Ji mercen wergerandin ev e ku, wê tistê mirov têbigihêje, têna gihêje." Yani ji orjinala tekste divê mirov bas têbigihêje ku, ew dixwaze ci bibeje. Wek Serefxan got, dema ji destê du an ji, yê sisêyan bê wergerandin, wê deme werger geleki tistên xwe



'Werger avakirina hevokan e û bi kulturê ve girêdayî ye'

winda dike. Ji ber ku her zimanek taybetiyen wi hene.

A. Tigrîs: Bas e, di dema wergerê de, hem ji zimanekî bîyani wergerandina Kurdi û hem ji, ji Kurdi wergerandina zimanekî din gelo zehmeti hene? Ku hene ew ci ne?

M. Mayî: Ji mercen wergerê yek jê ew e ku, ew zimanî ku mirov werdigerine ser, divê mirov gelek zana û sareza be. Mesela tu tekstekî werdigerînî Kurdi, divê tu di zimanî Kurdi de gelek sareza bi. Ya duymen divê mirov ji zimanî ku jê werdigerine ji gelek sareza be. Ji ber ku divê mirov bas têbigihêje ka ew dixwaze ci bibeje. Heger mirov bas sareza nebe, nizane kakilê naveroka wê ci ye. Wek Serefxan got, divê kodê wi zimanî bizanibe.

S. Cizîrî: Ez dikarim li ser xwe bibejiim, xebatê min hene. Ez bi Swedi û Tirkî bas dizanim, lê dema ez ji Swedi werdigerînim Tirkî, ez di Tirkî de gelek kemasîyan dibînim. Lê, kemasî di ku de ne? Problemîn Kurdi di ku de ne? Ez bawer nakim problemîn Kurdi ji aliye helbest û berhemên edebi ve zêde bin. Yani ji aliye ciroknîvisandin û romannîvisandin ve gelek tist bi Kurdi hene. Edebîyateke bi Kurdi heye. Lê, di xebatê ilmi de, yani ew xebatê ku picek tê de bi kuranahiyen felsefi û siyasi hebin di wir de gelek zehmetiyen Kurdi hene. Dema mirov dixwaze ji Swedi, Almanî, Ingilizi an ji, ji zimanekî din tistik wergerine Kurdi mirov zehmetiya

terman dibine. Terminoloji gotin e. Mesela ez dê ji te re gotineke gelek hesan bibejim. Gotina "konsektion" mesela. Bi hemû zimanî Ewrupi "konsektion" konsektion e. Min gelek caran Kurdiya wê ji hevalen Kurd pirsîye bersivek nedane. Dikare ji te re i-zeh bike, bibeje konsektion xwarin e. Xwarin bi maneya gisti. Materyal cêkirin bi xwe ji konsektion e. Bi Tirkî tuketim dibêjin. Herwiha di warê ekonomi, sosyoloji û felsefi de ji wiha ye. Gelo mirov cawa dikare van gotinan qezencê Kurdi bike. Jî vê yekê re, xebateke kür û dûr divê. Xebateke pîrhal jê re divê. Niha her Kurdeki bi serê xwe bûye zimanînebe, nizane kakilê naveroka wê ci ye. Wek Serefxan got, divê kodê wi zimanî bizanibe.

S. Cizîrî: Ez dikarim li ser xwe bibejiim, xebatê min hene. Ez bi Swedi û Tirkî bas dizanim, lê dema ez ji Swedi werdigerînim Tirkî, ez di Tirkî de gelek kemasîyan dibînim. Lê, kemasî di ku de ne? Problemîn Kurdi di ku de ne? Ez bawer nakim problemîn Kurdi ji aliye helbest û berhemên edebi ve zêde bin. Yani ji aliye ciroknîvisandin û romannîvisandin ve gelek tist bi Kurdi hene. Edebîyateke bi Kurdi heye. Lê, di xebatê ilmi de, yani ew xebatê ku picek tê de bi kuranahiyen felsefi û siyasi hebin di wir de gelek zehmetiyen Kurdi hene. Dema mirov dixwaze ji Swedi, Almanî, Ingilizi an ji, ji zimanekî din tistik wergerine Kurdi mirov zehmetiya

M. Mayî: Li gor baweriya min, problema me, di warê wergerandinê de destnisan nin e. Her kes bi serê xwe bûye werger. Mesela min hinek helbesten Gunnar Ekelof bi Swedi xwendin. Wergerandine Kurnanci. Ew tama Swedi ya ku Gunnar dixwaze bibeje, bi Kurdi ne ew e. Ji ber ku hevalê ku wergerandiye, tekst wergerandiye. Wergerandin ne ew e. Wergerandin ew e ku, ka-

kile wi wergerini. Bi awayeki helbesti. Min ditiye ji Farisi helbest wergerandine Sorani. Dema mirov bi Farisi nizanibe, mirov dibêje wele ev tistik bas e û orjinala Farisi dixwîne, ho ho du cihanen gelek ji hevdu cuda ne. Di nava me de rexnegir ji nin e ku, jê re bibeje "Bavo ev ne werger e. Te, ew heram kirîye..."

S. Cizîrî: Ez dixwazim cend tistîn diroki bibejiim. Ez bi xwe zêde bi Erebî nizanîm, lê ez hineki fêm dikim. Min diroka zimanî Erebî xwend. Pisti belavbûna islamê li Rojhilata Navin, zimanî Erebî zimanî koceran bû. Ebediyan bû. Zimanî wan ji, bi hebûna colê ve girêdayî bû. Gotinîn wan ji geleki gotinîn hesan bûn. Dema misilmanti fireh bû, vêca ihtiyaci ditin ku, tistîn felsefi, ekonomi û civaki binivisin. Lê ditin ku, zimanî wan têr nake. Cawa kirin, bi alykariya filehê Suryani, bi pistigirtina Xelîfe Bexdayê dest bi wergerê kirin. Ew cûn felsefa Yewnaniyên kevin wek a Platon, Aristoteles û gelek kesen din, bi riya filehan wergerandin û kirin Erebî. Ji 700'ê hefta 1000'î yanî 300 sal Erebân tist ji zimanî xwe re qezenc kirin. Tirkân ji eyni tist kirine. Osmanîyan di salen 1800'î de ditin ku zimanî Tirkî gelek qels e. Desti bi cêkirin buroyen tercümaniye kirin. Her wiha disa Ermeni. Rûm û filehan alykariya wana kirin. Bi riya wergerê zimanî xwe dewle mend kirin.

Dûmahîk rûpel 14